



Peyama Newrozî Ya Sekreterê Giştî Yê PDK Îranê...



2

Daxuyaniya Komîteya
Navendî Derheq Kongreya
Taqîma Mela Hesên Restgar



4

Li Ser Kongireya Yekem
A YXDK Hevpeyvînek Bi
Kerîm Perwîzî Re



5

Sedemên Têkçûna
Zewacan



7

Sultan Şêx Mûsayê
Mêrdînî



9


Hevpeyvîn Bi Hunermend
Şervan Re



10

Şehîd Dr. Ebdulrehman Qasimlo:

“GELEK KU AZADIYÊ BÎXWAZE, DÎVÊT NÎRXA WÊ AZADIYÊ JÎ BÎDE”



Di Rê û Resmeke Berfireh De, Şehîdên Kurdistanê Hatin Bibîranîn

Roja şemî, 10.01.1387 (29.03.2008)an, demjimêr 9'ê sibê, rê û resmeke hêja û berfireh bi hinceta 10'ê Xakelêwe, Roja Şehîdbûna Pêşewa Qazî Mihemed û hevalên wî di binkeya Deftera Siyasî a PDK Îranê de bi beşdariya Sekreterê Giştî ê Partiya Demokrat, endamên rêberiya vê partiye û Kadro û Pêşmerge û malbatên wan û herwiha hejmareke zaf ji nûnerên partî û rêxistinên siyasî ên Kurdistanê û kesayetiyên siyasî ên Kurd birêve çû.

Di destpêka rê û resmê de gişt kesên beşdar çûne ser gora Şehîdan. Piştî xwendina du sirûdên “Ey Şehîdan” û “Merêjin bom Firmêskî Xem” li ser gora Şehîdan, Mistefa Hicrî tevî Neşmîl Muradî, keça şehîd Qadir Muradî, destegulek danîn ser gora Şehîdan.

Dom. R. 3


Li 3 Parçeyên Kurdistanê Kurdan Ji Ber Pîrozkirina Newroza 2008'an, Bedel Dan

► Newroz cejna neteweyî ya Kurdan e û gelê Kurd Newroz 2008'an li sê parçeyên Kurdistanê (Bakur, Rojhilat û Rojava), di bindestî û kontrola xurt a leşkerî û ewlkarî de, bi awayekî gireseyî pîroz kirin. Li Bakurê Kurdistanê bi milyonan kurd herikyan û şahiyên Newroza îsal li gund û bajarên cur bi cur bi qirseyî pîroz kirin, Şehîd û birîndar dan, sedan kes hatin girtin û binçavkirin. Li Rojavayê Kurdistanê jî, gelê Kurd bi şahiyên qirseyî pêşwazî ji Newroza îsal kirin û çend kuştî, dehan birîndar dan û sedan kes jî hatin girtin. Li Rojhilatê Kurdistanê jî, her çend Newroz bi awayekî fermî azad e, lê gelê Kurd ji ber



rewşa leşkerî – ewlkarî nekarî û nevêran bi kom û qirseyî şahiya Newrozê pîroz bikin, Kurdên Rojhilatê neçar man di nav malên xwe û civînên taybetî şahiya Newroza 2008'an pîroz kirin.

Peyama Newrozî Ya Sekreterê Giştî Yê PDK Îranê



Mistefa Hicrî

H ewelatîyên xweragir û
xwedî bawer!
Xelkê azadîxwaz yê

Kurdistanê!

Malbata serbilind a şehidan û girtiyên xweragir ên siyasî!

Endam û alîgirên xebatkar ên Partiya Demokrat a Kurdistanê!

Kadro û Pêşmergeyên netirs û can li ser dest ên Kurdistanê!

Sala 1386'an a Rojî, bi hemû nexweşî, destkevt û serkevtin ve borî û hevdem tevî hatina werza çêbûna xweziyê û nûbûna salê û cejna neteweyî a Newrozê, em pê davêjin sala nû a 1387'an a Rojî.

Hevdem tevî nûbûna salê û rêvebirina cejna neteweyî a Newroza Kurdan, em dê gavên xwe ji bo meşandina rêya teji kosp û asteng ya xebatê xurttir û hêviya rizgarî ji bindestî û çewisandinê di nava dilê xwe de gurtir û asoya serkevtin û gihîştin bi maf û azadiyên xelkê Kurdistanê, ronahîtir û geştir bibînin.

Em di demekê de xatira xwe ji sala 86'an a Rojî dixwazin ku Îran û Kurdistan di zulmet û tarîtiya sistema paşverû û azadîkuj a Welayeta Feqîh de, yek ji salên reş û bixof ên êxsîrî û koletiya xwe ceriband.

Li vir em dê nihêrîneke kurt bi ser wan kirîz û qeyranan bikin ku rejîma kevnepereşt a zal bi ser Îranê, di her sê warên hundirîn, herêmî û navneteweyî de bi sedema siyaseta şaş û serberedayî a xwe anîne holê:

A- Siyaseta hundirîn:

Rejîma gemar a Melayan her ji destpêka hatine serkara xwe ve, bi sedema sernetewandin ji bo xwestek û daxwazên

rewa û berheq ên neteweyên pêkîner ên Îranê, di asta navxweyî de, politîkek şaş û tepeserker meşand û kire rêbaza xwe û wê siyaseta jî tu encamek ji bilî serkut, qirkirin, betalî û bêkarî, îtiyad û kişandina madeyên hişber, riziyoq û gendelî û xurtbûna roj li pey rojê a diyardeyên biyom ên civakî li şûnde nebûye.

Di sala 86'an de, rêjeya îdamê li gor salên borî, du qad zêde bûye, rejîma Komara Îslamî di warê daliqandina kesên bin temen 18 saliyê de, di nava hemû welatên cîhanê de, di pileya yekem de ye. Qasê herî zêde a kevirbarankirina jinan di Îrana Melayan de tê meşandin û rêjeya herî zaf a rojnamevanên girtî di cîhanê de, di çalên reş û tarî ên wê rejîmê de, jiyane dibihurînin û Îran e bûye girtîgeha herî mezin a rojnamegeran di cîhanê de.

Rêberên rejîmê li serveyî dijberên azadiya gotin û raderbîrîne di cîhanê de di girtine, sedan hezar zarokên bêpar ji tev mafên jiyane, bi eşkere di şeqaman de

û li ser rêyan tîn xuyakirin. Di Îranê de, bi milyonan mirov rasretast û nerasterast, bi destê madeyên hişber, dinalin û tûşî vê belayê bûne, awsan û enflasyona aborî ji sînorê %20'ê derbas bûye, zêdetirî 20 milyon kes di Îranê de, bi destê bêkarî, bêdahaatî û belengazî û rojreşiyê dinalînin. Gelaleya binav tenahiya civakî, yê

dest avêtiye hevika azadiyên takekesî û Îran e bûye girtîgeheke mezin ku xof û tirs lê dibare.

Di sala 86'an de, tevgera jinan, kedkar, xwendekar û mamostayan bi awayê herî hov û dirindane hatin serkut û tepeserkin û zext û givaşek bêminak, kete ser neteweyên bindest ên Kurd, Belûç, Ereb, Azerî û Turkmen.

“Hevdem tevî nûbûna salê û rêvebirina cejna neteweyî a Newroza Kurdan, em dê gavên xwe ji bo meşandina rêya teji kosp û asteng ya xebatê xurttir û hêviya rizgarî ji bindestî û çewisandinê di nava dilê xwe de gurtir û asoya serkevtin û gihîştin bi maf û azadiyên xelkê Kurdistanê, ronahîtir û geştir bibînin “

Her çiqas sala 86'an a Rojî sala serkut û qirkirina sistematîk û dirindane a neteweyên bindest, rojnameger û çalakên sivil, tevgerên civakî ên jinan, kedkar, xwendekar û mamostayan bû, lê bi rûmet û serbilindî ve, îsal sala berxwedan, ranewestan û mafxwaziye jî bû. Di vê navberê de, xebat û berxwedana xwendekarên Kurd di zanîngehên Kurdistanê û bajarên din ên Îranê tevî ne wekhevîyan de, cihê diyar û hêjayî xwe hebû.

Di vê salê de, rejîma tepeserker a Komara Îslamî a Îranê, tu alaveke serkut û qirkirine nema ku mifahê jê nestîne û neceribîne, lê bi şanazî ve, nekarî ruhiyeta şores û berxwedana gelên bindest ên Îranê û tevgerên xelkê û civakî rastî têkçûnê bike û pêlên xurt ên nerazîbûna xelkê û rûhiya berengarî heta rojên dawî ên sala 86'an a Rojî, her dom kir. Her ew giyanê şores, berxwedan û nerawestana sala 86'an a Rojî ye ku ji bo pêşwazîkirin ji sala nû û pêşdebirina wê xebata berheq di sala



1387'an a Rojî de hêviyê dide me.

Hewwelatîyên xebatkar!

Şanosaziya hilbijartina tûra heştem a Meclîsa Şewra Îslamî ku çend rojan berî niha birêve çû, serbarê çend mehan hewl û xebata hikûmetê bi armanca rakêşana xelkê bo ser sindoqên dengdanê, ne tenê nekarî rewa û meşrûiyetê ji bo rejîmê bi destkevt bîne, belkî vê carê bû sedema abrûçûneke din ji bo hikûmetê. Vê carê heta Yekîtiya Ewropayê jî bi eşkere îlan kir ku ev hilbijartinane ne azad û ne dadperwerane bûn. Îlankirina çend qatan zêde a hejmarê dangan ji aliyê dem û dezgehên hilbijartinê ve nekarî rûyê biyom û kirêtê e vê şanogeriya bipeçêve.

B- Asta Herêmi:

Ajave û Fitneçîtiya rejîma aştinexwaz a Komara Îslamî û maytêkirinê wê di nav kar û barên welatên deverê di tevahiya salê de, ne tenê berdeham bû, belku bi awayekî bêminak her li Pakistan, Keşmîr û Efxanistanê ve heta welatên kêleka Kendava Fars, Yemen, Îraq, Lubnan û Filistinê kire qada fitne û ajawêçêkirinê û şandina teror û reşekujiyê û bi vî awayî ev rejîma terorîstperwer di bir û raya giştî a akinciyên hemû herêma Rohhilata Navîn de e bûye maka neewleyiya siyasî, teror û reşekujiyê û mijûl e ev fikre di hizr û ramana siyasatvan û rûniştvanên navçeya Rohhilata Navîn de çih digre ku bi hebûna rejîma têkder a Welayeta Feqîh, egera çihgirbûna aşî û tebahiye di wê deverê de tune ye û hewce dike ji holê were rakirin.

C- Di asta navneteweyî de:

Di sala 1386'an de, pîrsa bernameya gumanbar a projeya Etomî a Îranê, bûye doza herî girîng a civaka cîhanê û niha rejîma Komara Îslamî take rejîma cîhanê ye ku rasterast e ketiye dijberîkirin tevî tenahî û aştiyê di asta navneteweyî de û metirsîyên wê rejîmê bo ser ewlekarî û aştiya cîhanê, komdengiyê cîhanî li dijî wê rejîmê di asta Konseya Ewlekarî ya Rêxistina Neteweyên Yekbûyî de derket

dolê, bi terzekê ku di çaxê nêzik bi sê dehsalan ji temenê biyom û gemar yê rejîma Melayan de, tu demekê komdengiyê wisa li dijî wê rejîmê di asta cîhanî de nehatiye dîtin. Encama wê komdengiyê jî di sê biryarnamên 1737, 1747 û 1803'an a Konseya Ewlekarî a RNY de xwe derxistiyê holê.

Hewwelatîyên hêja! Civatên xelkê mafxwaz yê Kurdistanê!

Her çiqas ku rejîma Komara Îslamî di her 3 warên navxweyî, herêmi û navneteweyî de bi komek kirîz û qeyranên bêwêne berbirû ye, lê ew kirîzane bi tenê nikarin wê rejîma serberedayî û dîktator bi tavahî rastî têkçûnê binin. Lewra em bawer in ku rêya ji holê rakirina rejîma azadîkuj a Komara Îslamî, tenê ji rêya hevgerî û hevpewendî û xebata bêrawestan û bi bernama a hemû neteweyên Îranê û giştî hêz û tevgerên siyasî û civakî misoger dibin.

PKD Îranê ji bo gihîştin bi wan armancane amade ye hemû cure alîkarî, hevpewendî û hevxebehiyê bike, tenê bi mercekê ku encama wê xebatê, demokrasiya ji bo Îranê û dabînbûna mafê neteweyî ên gelên zilmjêkirî ên Îranê û yek ji wan neteweya Kurd jê çêbe. Di vê pêvajoyê de em dê bixebitin ku Kongreya Neteweyên Îrana Federal bihêztir û çelengtir bikin.

Xelkê heqxwaz ê Kurdistanê! Hevalên qedirbilind!

Di sala 1386'an de, metodên herî hov û dirindane û bêminak ên serkut û qirkirinê li ser xelkê Kurdistanê hatin ceribandin, lê bi rûmet û şanazî ve, gelê me weke herdem bêdengî ret kiriye û rêya berxwedana qehremanane girte pêşberî xwe û selimand ku ew gelê mafxwazî, divêt bi hemû maf û azadiyên xwe bigihîje û bi dest bixe.

We xelkê heqxwaz yê Kurdistanê di sala 86'an de, bi daxistin û girêdana dikan û bazaran di salvegera terorkirina rêberên xwe yê zana û leheng, selimand ku hûn

dirêjederên rêya teji serfirazî û rûmet a Şehîdên gel û partiyê ne. We xelkê şoreşvan, bi nivîsîna dirûsmên şoreşgerane û belavkirina tirakt, CD û wêneyên Şehîdan di hemû boneyên neteweyî û hizbî de, nişan da ku hûn keç û xortên biemek ên vê welatê pîroz in û hêjayî hemû cure destxweşî, spas û pêzanînekê ne. Beşdarînekirina we a berfireh û ya çihê rêz û qedirgirtinê di tûra heştem a şanosaziya binav hilbijartina Meclîsa Şewra Melayan de, ji aliyê nişanderê hişyariya siyasî a we ya bilind bû û ji aliyê din ve ji raya giştî a cîhanê jî selimand ku ji wê rejîma azadîkuj bêzar in û dixwazin guhartinê bingehî di sistema paşverû a desthilatdar bi ser Îranê de çê bibin.

Ez bi nûnerî ji aliyê rêberiya Partiya Demokrat û Kadro û Pêşmerge û endamên wê ve, ji vî tirbonê ve silavên emek û wefadariyê pêşkêşî we dikim û radigehînim ku hemû xebatkarên demokrat, şanazî û rûmetê bi hişyarî û netirsî û hesta we ya şoreşgerane dikin.

PKD Îranê, partiya rêberên Şehîd Qazî, Qasimlo û Şerefkendî ye, mêt dem e biryar daye heta serkevîtinê neraweste û ji evraz û nişivên xebatê de, tenê pişt a xwe bi alîkarî û berevanîkirina bêdawî a we civatên xelkê girê bide.

Di dawiyê de li ser navê tim rêberiya PDK û hemû Kadro û Pêşmerge û endamên xebatkar ên partiyê ve, nûbûna salê û cejna neteweyî a Newrozê ji we pîroz dikim û hêvîdar im sala nû bibe sala gihîştin bi tev maf û azadiyên neteweya me a zilmjêkirî.

Silav li xelkê Kurdistanê, piştevanên herdemî ên Partiya Demokrat!

Mirî ji bo Şehîdên birûmet ên Kurdistanê!

Silav li hemû girtiyên siyasî ên ku di van rojên cejnê de di çalên reş û tarî ên Komara Îslamî de diborînin!

Mirin û neman ji bo dijminên azadî û mafê gelan!

Di Rê û Resmeke Berfireh De, Şehîdên Kurdistanê Hatin Bibîranîn

Doma Rûpela 1

Piştê rê û resm di nava hola rêvebirina rê û resman a PDK Îranê de dom kir û destpêka merasimê bi xwendina sirûda netewî a "Ey Reqîb" û deqîqeyek bêdengî bona rêzgirtin ji canê paqîj yê Şehîdên Kurdistanê dest pê kir.

Piştê peyama Komîsyona Civakî a PDK Îranê ji aliyê **Luqman Mêhfer**, endamê Komîteya Navendî a vî partiyê û berpîsê Komîsona han ve hate pêşkêşkirin. Navhatî di peyama xwe de îşare bi vî çendê kir ku neyarên netewa Kurd herdem xwastine, bi şehîdkirina rêberên Kurd pêşî ji xebata berheq a netewa me bigirin, lê gelê Kurd qet dest ji



xebatê ber nedaye û meydana xebatê ji bo neyarên betal nekiriye. Deqa peyama Komîsyona Civakî di paşkoya taybet a vî hejmarê Agirî de bixwînin.

Di doma rê û resmê de hunermend

Tahir Xelîlî, sirûda bi nav û deng "Le Qendîlî Serberzewe" pêşkêşî beşdaran kir. Ew li derveyî welat tevî rê û resma Roja Şehîdên Kurdistanê bûbû.

Herwiha çend helbest, sirûd û peşxan bi vî hincetê hatin pêşkêşkirin.

Di dawiya rê û resmê de pêşangeha wêneyên Şehîdan ji aliyê Seyîd Riza Dirûdger ve hate vekirin.



Daxuyaniya Komîteya Navendî Ya PDK Îranê Derheq Encama Dawî Ya Kongreya Taqima Mela Hesên Restgar

i bo raya giştî:

Kongreya Taqima Mela Hesên Restgar di nîva meha Reşeme a

sala 1386 (nîva heyva Adara 2008) an dawî pê hat. Bi baldan bi naverok û çend xalên biryar ku di daxuyaniya bidawîbûna wê kongreyê û herwiha di hevpeyvînên çend kesayetiyan rêberiya wan de hatiye holê, me bi hewce zanî nêrîn û dîtînin xwe li ser encamên wê kongreyê rabigehînin.

1. Bi liberçavgirtina wê rastiye wê:

- Cudabûna wê girûpê ji Partiya Demokrat a Kurdistanana Îranê di berrav 15.09.1385 (06.12.2006) an de, cudabûna kêmaniyekê ji rêberî û bedeneya PDK Îranê bû.

- Nûnerên wê kêmaniya rêberiyê di kongreya sêzdehem a partiye de beşdar bûn, deng bi rewa û meşrûbûna kongrê dane û nêzîk salek û nîvan piştî Kongreyê ji partiye veqetiyane.

Heq bû bi naveke din kongreya xwe a yekemîn lidar xistiban û xebat û tekoşîna xwe meşandiban.

2. Di dema cudabûnê heta lidarxistina kongera wan de, me ji rêya dost û dilsozên tevgera kurd hemû cehd û hewla xwe da heta ew naveke din ji bilî navê **Partiya Demokrat** li ser xwe danên, lê mixabin



berevajî hemû urf û qanûnekê û heta pêrewa hundirîn a partiye û rêbazên demokratîk ku di kongreya sêzdehem de bi xwe pejirandibûn, bi armanca parastina véc û berjewendiyên taqim û girûpî, bala xwe nedan wê rastiya xuya û eşkere û tu girîngî û bihayek ji hewl û bizava heval û dilsozên gelê me re nedan. Lewra ew karê wan dibe kosp û astengek mezin li ser rêya alîkarî û asayîbûna pêwendiyên di navbera me û wan de û bi awayekî nerasterast bandora neyînî li ser pêvajoya hevkarî û jihevnezişkûna hêzên Kurdî ên Kurdistanana Îranê dike, lewra mesleheta tevgera gelê me wisa dixwaze ku ew bi naveke din kar û

xebatên xwe bidomînin. Di rewşeke wisa de, em amade ne tîkiliyên xwe normal û asayî bikin û hazir dibin her cure alîkariyekê bikin.

3. Bi vî awayî encama wê kongreyê û pêrewkirina wê polîtîkê, berevajî bangeşeyên wan, bi kiryar li dijî "jihevnezişkûna partiyan kurdî" û "girîngî û baldana taybet bi hewcehiya yekîti û hevkarîye di asta neteweyî û di asta Rojhilatê Kurdistanê de" û yek ji wan Partiya Demokrat ya Kurdistanana Îranê ye.

Civîna berfireh a Komîteya Navendî ya PDK Îranê a danzdehem bi berçavgirtina wan xalane û analîz û şîrovekirin tevalî a encama wê kongreyê, serbarê xuyakirina kul û kesera xwe ji wan biryarên bê prensîp û bê usûl, îlan dike taqima han ji bo domandina erk û xebatên xwe bi navê **Partiya Demokrat ya Kurdistanê** asteng û kospeke mezin li ser rêya asayîkirina pêwendî û her cure hevkarî û hevalbendiyekê tevî PDK Îranê pêk aniye. Lewra ji em hêvî dikin ku ew di pêxema véc û berjewendiyê giştî a tevgera kurd di Kurdistanana Îranê de, nihêrinekê bi wê biryara xwe bikin û bi kiryar û piratîk rêya hevkarî û hevxeberiyê di nava hêzên Kurdistanana Îranê de pêk bînin.

Partiya Demokrat ya Kurdistanana Îranê
Komîteya Navendî
27.03.2008
08.01.1387

Parlamentoya Danîmarka Yekemîn Car Di Dîrokê Da Deriyên Xwe Ji Bo Cejna Newrozê Re Vekir

B i henceta cejna neteweyî a Newroza 2008'an, gelê kurd wek hemû salan îsal jî him li welêt û him jî li derveyî welêt li cejna xwe a Newrozê xwedî derketin û

ew bi çoş, bi girseyî û bi germahiyek mezin pîroz kirin. Îsal jî li welatê Danîmarka bûyereke, ku gelê kurd pê kêfxweş û serbilind dike, rû da.

Di roja sêşem, 25.03.2008'an da endama Parlanto a Partiya Sosyalîst a Gel (SF), keça kurd Özlem Sara Çekiş li ser navê partiya xwe SF'ê bi alîkariya serokê KOMKAR-DK birêz Serhad Amedî yekemîn car di dîroka Danîmarka da cejna gelê kurd a Newrozê bi kokteylekê li Parlamentoya Danîmarka li dar xist.

Kokteyla Newrozê a li Parlamentoya Danîmarka, ku di lokala grûpa endamên parlanto a SF'ê da pêk hat, ji seat 15.00 heta seat 18.00'an berdewam kir û ji serî heta dawiyê bi axaftin, bi xwarin û vexwarin û bi muzîk û dîlana kurdî di nav kêf û şahiyek mezin da û bi awayekî serkeftî derbas bû.

Maseya kokteylê li gor simbol û armanca navê Newrozê bi gulên kesk û sor û zer, ji gellek cureyên fêkî (meywe), xwarinên kurdî ên cur be cur û vexwarinên wek şeraba sipî û a sor û şampanya û hwd, hatibû rayêxistin û wê rojê lokala grûpa SF'ê bi şîkil û rengên kurdî hatibû xemilandin. Gellek kurdên ku beşdar bûn bi cil û berg û şal û şapikên xwe ên kurdî ku yek ji ên din xweşîktir û lihevhatîtir bû, bê guman rengêkî din ê taybet dida wê şahiya qedirbilind û bi wate.

Di kokteyla Newrozê da zêdeyî 100 kurd û

danîmarkî beşdar bûn, ku di nav wan da gellek endamên parlanto, siyasetmedarên danîmarkî, rojname û kanalên televizyonê jî hebûn. Ji aliyê medya kurdî va wek nîmûne Kurdistan TV û xwediyê van rêzikan wek nûçegihanê Dengê Kurdistan, rojnameya Dema Nû û Tjşk TV beşdar bûn. Her wekî din ji aliyê medya danîmarkî û tirkî va jî baş beşdarî hebû û rojnameyên tirkî ên wek Haber, Milliyet, Hurriyet, Zaman û CNN Turk jî ew baş şopandin. Endama parlanto ji Partiya Sosyal demokrat, Yıldız Akdoğan, ku bi eslê xwe kurda Çorum'ê ye jî wek mêvan beşdarî wê kokteyla Newrozê bû.

Kokteyla Newrozê ji aliyê keça kurd Özlem Sara Çekiş va hat vekirin. Piştî bixêrhatina mêvanan Özlemê dest bi axaftina xwe kir û li ser armanca û naveroka cejna Newrozê sekinî. Özlemê di axaftina xwe da bal kişand ser wateya Newrozê a ji bo gelê kurd.

Piştî axaftina Özlemê serokê SF'ê Villy Sovndahl jî axaftinek delal kir, qala siyaseta partiya xwe, pêwendiyên partiya xwe û kurdên li Danîmarka kir, kêfxweşiya xwe a ji bo endametiya Özlemê û wê çalakiya Newrozê ku bi piştgiyariya wan hat lidarxistin anî ziman û bi berdewamî piştgiyariya xwe a ji bo mafê gelê kurd destnîşan kir

Herwiha endama meclisa şaredariya "Fureso Kommune", Helene Lund, ji partiya SF'ê jî axaftinek kir, kêfxweşiya xwe ji bo lidarxistina cejna Newrozê anî ziman û li ser kar û xebata xwe û pêwendiyên xwe ên li gel şaredariyên li

Bakurê Kurdistanê axivî.

Serokê berê ê SF'ê Holger K. Nielsen jî, ku niha endamê parlanto ye, wek axaftvan hatibû vexwendin û wî jî bi rastî li gor tecrûbeya xwe û bi nêzîkbûna xwe a ji bo çareserkirina pirsgerê kurdî di nav salan da axaftinek gellek bedew kir. Wî jî dîr û dirêj bahsa zilm û zordariya li ser gelê kurd kir û piştgiyariya xwe a ji bo gelê kurd dubare kir. Di berdewamiya axaftina xwe da got, ku mafê gelê kurd e ku ji bo maf û azadiya xwe kar û xebatê bike û destnîşan kir ku herçiqas ku îro bi navê Kurdistanê bi fermî welalet nine jî, lê netewa kurd heye û got ku heta ku kurd li van nîrxên xwe ên neteweyî xedî derkevin wê di nav her civakan de jî piştgiyariya jî bo wan bê dayin. Holger K. Nielsen herwiha bal kişand ser rewşa Başûrê Kurdistanê jî û got ku vaye kurd li wir gihîştine azadiya xwe û Saddamê dîktetor jî, ku bi salan kurd qetil kirin, niha di nav agirê cejnê de ye.

Ji destpêkê heta dawiyê hunermendên hêja Yaşar Taş, Enis Ayhan Ahmed û Sadiye Ozdemir (Mizgin) ji mêvanan ra muzîka kurdî pêşkêş kirin û ew rakirin govend û dîlana kurdî. Herdu serokên SF'ê, ê nû û ê berê, Villy Sovndahl û Holger K. Nielsen jî rabûn govendê û wan jî bi vî rengî kêfxweşiya xwe a ji bo cejna kurdan a neteweyî eşkere kirin.

Partiya Sosyalîst a Gel (SF) û Parlamentoya Danîmarka îsal bi vî şeweyî mohra xwe li cejna Newrozê dan û kurd himbêz kirin. Li gor agahdariyên Özlemê wê di sala pêş me de hemû partiyan li parlanto cejna Newrozê bi hev re lidar bixin.

Kopenhag
27.03.2008

Kerîm Perwîzî: “YXDK Îranê Şanaziyê Dike Ku Şagird û Xwendekarê Mekteb û Bîra Mamostayê Demokrasiyê Dr. Qasimloyê Nemir Be”

Hevpeyvîn: Selîm Zencîrî

Xwendevanên hêja yên Agirî, Yekîtiya Xwendekarên

Demokrat Yên Kurdistanê Îranê sê salan berî niha, anku payîza sala 2005'an avabûna xwe ragihand û kar û xebatên xwe ji bo wergirtina endaman û organizasyona xwe li hundir û derveyî welat da destpêkirin. Desteya Avaker ya vê yekîtiyê di heyamê wan sê salan de, erkê birêveberiya Yekîtiya Xwendekarên Demokrat girtibû stûyê xwe û bi kar û xebatên berdewam û çalakane yên xwe karîn xîm û bingeha vê yekîtiyê bihêz û qahîmtir, herweha rêxistina xwe jî berfireh, xurt û ektîvtir bikin heta gihandine vê qonaxê û bi hewce zanîn ku kongreya yekemîn a xwe lidar bixin.

Hêjayî gotinê ye ku kongreya vê yekîtiyê di 17 heta 20'ê Adara îsal di bin navê RABÛNê de dest bi kar û xebatên xwe kir û di encam de bi pîlan û piroje û hîlbijartina rêveberiyê nû bi serkevtin ve dawî bi karê xwe anî.

Lewre me jî bi hewce zanî çend pirsîyaran derheqî kongreya wan û awayê birêveçûna wê, raberî Sekreterê Yekîtiya Xwendekarên Demokrat yên Kurdistanê Îranê, birêz Kerîm Perwîzî bikin ku em bala we bo xwendina hevpeyvînê dikişînin:

Kek Kerîm, di destpêkê de em bi boneya serkevtina kongireya we ya yekemîn pîrozbahiyên herî germ pêşkêşî rêveberiya nû û hemû endam û alîgirên Yekîtiya Xwendekarên dikin û hêvî dikim ku hûn di xebat û tekoşîna xwe de serkeftî bin.

Ez jî spasiya we dikim û bi nûneratiya Yekîtiya Xwendekarên Demokrat yên Kurdistanê Îranê ve, pêrozbahiya serkevtina yekemîn kongreyê ji hemû endamên vê rêxistinê, bi taybet li hundirê welat û li zanîngêhên Kurdistanê û Îranê de dikim û hêvîdar im rêveberiya nû di erkên pêspartî yên kongireyê de serkeftî bin.

Em dikarin bizanin ku armanca we ji girtina kongireyê çî bû?

Kongreya her rêxistinê, kombûna bîr û rayên endamên wê rêxistinê ye. Desthilata herî bilind û çavkaniya biryardana di rêxistinê de ye.



Kongreya rêxistinê dengê rohn û êşkere yê endamên rêxistinê ye ku bi kombûna di cihê kongreyê de çalakî, tekoşîn, biryar û birêveberina erk û wezîfeyan di heyamê borî de dinirxînin û erk û wezîfeyên nû ji bo pêşeroja rêxistinê destnîşan dikin.

Bi vî awayî kongre koma dangan û encama bîr û rayên rêxistinê ye, lewre Yekîtiya Xwendekarên Demokrat jî bi liberçavgirtina van rastiyan û piştî borîna sê sal bi ser avabûna xwe de, bi hewce zanî ku kongreya yekemîn a xwe lidar bixe. Di heyamê sê sal avabûna xwe de, karên bingehîn û eslî yên vê rêxistinê birêve çûbûn û zêdetir ji wê jî, gavên dîrokî û girîng hatibûn avêtin.

Ji bo pêkanî û avakirina her rêxistinê hewce ye aliyê kêr di çend waran de gavên destpêkî bihên avêtin û xîm û bingeha wê li ser çend waran de bihê raçandin. Biyava yekemîn, rêxistinî û teşkilatî ye. Bi vê manayê ku rêxistinê di destpêka avabûna xwe de hewce dike hin kesan weke endam li dora xwe kom bike û organîzasyonê ji wan re pêk bîne ku li gor wê organîzasyona bingehîn, him endam bi awayekî rêxistinî û organîzekirî bi hev re kar bikin, him jî çarçoveya rêxistinê çê bikin û şêl û xemlekê jê re bidin.

Yekîtiya Xwendekarên Demokrat û Desteya Avaker a wê di heyamê wan sê salan de, karên gellek binirx û girîng encam dan û pêkhatiya xwe jî çê kiribû, heya qasekê jî pêş ketibû û metod û şêwaza organîzasyonê kemilî bi xwe ve girtibû û dikarin weke parek organîzebûyî kar bikin. Biyava din a bingeha her rêxistinê, ragihandin e ku Yekîtiya Xwendekarên Demokrat bi serkevtin ve karî di vê

beşê de jî kanalên ragihandinê weke Kovar, Malpera Înternetî û bernameya Radyoyî bidest bixe û hewl û xebatê ji bo destveanîna ragihandina bi reng jî bike.

Di biyava pêwendiyê de jî gavên baş avêtin û li ser perwerdekirina endam û gihandina nêrîn û rayên yekîtiyê bi tex û qatên pêwendîdar, konferans, sêminar û civînên baş û bimifah pêk anîn.

Bi giştî di gellek karên xwe de serkevtinên baş bidest xistibû. Herweha rêbaz, hêla teşkilatî û nîşan û sembola bizav û rêxistinê hatibûn destnîşankirin û gav jêre hatibûn avêtin. Lewre bi berçavgirtina van rastiyan û herweha hewcehiya nûbûn û dengstandina giştî ji endaman, Desteya Avaker gihîste wê baweriyê ku yekemîn kongreya xwe lidar bixe û êşkere bike ku organîzasyona wan dikare xwe vejîne û xwe nû bike.

Kongreya we di bin navê “RABÛN”ê de dest bi karên xwe kir, çima Rabûn?

Merem ji hîlbijartina vî navî, du tiştên sereke bûn: Yekem, eva ku em bêjin Yekîtiya Xwendekarên Demokrat û bizava xwendekarî a kurd bona xebat di pêxema armanc û hêviyên xwe de rabûne. Duyem, hayder û palderek ji bo xwendekarên ezîz û hêja be bona tevlibûn bi bizava xwendekarî a kurd û Yekîtiya Xwendekarên Demokrat.

Asta beşdariya xwendekarên keç li kongireyê, li bas û niqaşên nav kongirê û herweha di rêveberiya nû de çawa bû?

Mixabin civaka Kurdistanê, civakek paremayî ye û ji bo beşdariya jinan û keçan di jiyana siyasî, civakî û aborî de astengî û pîrsgirêkên zaf diafirîne û heya

niha jî beşdariya jinan û keçan di kar û barên siyasî û rêxistinî de negihîştîye vê radeyê ku, xwast û daxwaza her mirovek azadîxwaz û wekhevîxwaz e. Hêviya hemû azadîxwazekê ye ku beşdariya jinan û keçan di jiyana siyasî- civakî de hevterîb ligel mêr û xortan be û weke hev û bi yek qas beşdar bin, ku mixabn hêj di Kurdistanê de cih negirtiye û bi tevahî piraktîze nebûye. Lê serbarê wana, asta beşdariya keç û jinan di kongreya Yekîtiya Xwendekaran de nêzik bi %40 a beşdarên bû ku eva jî bi xwe cihê hêviyê ye. Em hêvî dikin di pêşerojê de ew radeye bibe %50, anku wekheviya temam ligel mêran. Keçên endam di kongireyê de jî bi xweşî ve di bas û nîqaş, raderbirîn û biryarên kongireyê de beşdariyek ektîv û bibandor hebûn û di encama hilbijartina rêveberiya nû de karîr nêzik bi 30 ji 100'ê ya rêveberiya nû pêk bînin.

Heya çiqas mirov dikare bi demokratîkbûna kongireya we hêvîdar be?

Bi raya min û bi raya endamên kongreyê jî ku di bas û mijarên kongrê de beşdar bûn, kongre, kongreyek azad û demokratîk bû, azadiya raderbirîn û nêrîn û dîtina takekesan bi tevahî misoger bû û bi awayekî demokratîk, şoreşgirane û bi têngîhîştin ve li ser hemû kar û biryarên kongreyê bas û qal dihat kirin. Herweha hilbijartinek azad û bi tevahî demokratîk birêve çû ku di encam de rêveberiyek jêhatî û bişiyar ji bo rêxistinê hate hilbijartin. Herweha di basên nav kongreyê de jî pê li ser ceribîn û bihayên girîng yên serdem û yek ji wan jî demokrasîxwaziyê hate çeqandin û rêbaza rêxistinê bi rêbaza netewî- demokratîk hate binavkirin û pesendkirin. Herweha kongreya Yekîtiya Xwendekarên Demokrat jî qewl û soz da ku girêdayî û pabend bi rêbaza demokrat be û şanaziyê dike ku şagird û xwendekarê mekteb û bîra mamostayê demokrasîyê, Dr. Qasimloyê nemir be.

Kongreya Yekemîn çî piroje, stratejî yan mekanîzmek ji pêşeroja Yekîtiya Xwendekarên Demokrat yên Kurdistanê Îranê destnîşan kir?

Di kar û xebatên kongreyê de bi hûrî bas li ser pênaseya xwendekar, nasnameya xwendekarên kurd û bizava xwendekarî a kurd hate kirin û tekoşîn û xebata Yekîtiya Xwendekaran di vê derheqê de bilind hate nixandin. Herweha pê li ser gavên dîrokî yên wê hate çeqandin. Yek ji wan gavên ku Yekîtiya Xwendekarên Demokrat avêtibû, diyarîkirina rojek ji salê bi navê **Roja Xwendekarên Kurd** bû ku roja 12'ê Banemerê, salroja şehîdbûna **Şehîd Simayîl Şerîfzade** wekî Roja Xwendekarên Kurd diyarî kir. Herweha biryar hat girtin ku li ser pênasekirina xwendekarê kurd û xurt û berçavkirina nasnameya wan, çî li Îran û çî jî li derveyî Îranê de gavan bavêje û kar û xebat bona bihêz û xurtbûna baştir a bizava xwendekarî bike. Herweha li ser karên vê rêxistinê di warên cur bi cur yên rêxistinî, ragihandin, pêwendî û hînkirinê de biryarên girîng hatin dayîn. Bi hêviya ku rêberiya nû ya hilbijartiya kongreya yekemîn a Yekîtiya Xwendekarên Demokrat yên Kurdistanê Îranê erk û wezîfeyên xwe bi başî bi çî bîne û di pêxema hêvî û armancên xwendekarên azadîxwaz yên kurd de xebat û tekoşîna berbiçav û xurt hebe.

Birêz Kerîm Perwîzî, Sekreterê Yekîtiya Xwendekarên Demokrat yên Kurdistanê Îranê, pîrr spas ji bo beşdariya we di vê gotûbêjê de. Her bijî û serkevtî bin.

Spas û serkevtin ji we re jî.

Şiroveya Peyvên Siyasî

Berhevkar: Omîd Esxeran

omid_anbi@yahoo.com



Demokrasî "Democracy"

Têgiha demokrasîyê ji du peyvên Yûnanî anku "Demos" bi wateya gel û "Kratos" bi wateya desthilatê hatiye wergirtin û bi giştî tê wateya hikûmeta gel bi ser xwe de. Demokrasî ji desthilatdariyekê re tê gotin ku tê de welat ji aliyê gel bixwe ve tê

birêvebirin ku eva dibe sedem hevberiyek civakî û siyasî di navbera giştî tex û qatên civakê de pêk bê. Di encama vê çendê de, wekhevî û rêzgirtina takekesan ji hev tê holê. Bi vî awayî giştî kar û barên welat ji aliyê gel ve tên nixandin û delîve ji bo azadiya raman û rexnegirtinê xweş dibe. Demokrasî xwediyê dîrokek dirêj e û nêzik 500 salan berî zayînê (2500 salan berî niha) li bajarê Atenê hatiye ceribandin. Demokrasîya Atenê weke demokrasîya rasterast dihat nasîn. Akinciyên wî bajarî di heyamek diyarîkirî de, li dora hev dicivayan û nûnerên xwe jî bo birêvebirina kar û barên bajêr û dadwerîkirin hildibijartin. Her wiha di civînên han de, pirsên girîng diketin ber bas, nîqaş û dengdana giştî. Ezmûna demokrasîya rasterast piştê li Romayê hatiye ceribandin, lê ser neket, lewra heyamekî zaf dom nekir. Her çend ku demokrasî berê ji hikûmeta kes yan kesên taybet re dihat gotin û di hin welatên Ewropayê de jî dihat meşandin, lê di nîviya sedsala 19'an de, ji ber çalakiyên hin fîlosof û bizava berdewam a gel gellek welatên çîhanê rû ji sîstema demokratîk kirin.

Bi giştî demokrasî hikûmetek e ku bi hevkarîya gel tê cihgirkirin û daxwaz û xwestekên gel tê de bandora xwe hene. Di heyamên derbazbûyî de, demokrasî bi ser çend ta û desteyan de hatiye parvekirin ku pêkhatî ne ji:

A). Demokrasîya rasterast ku tê de dengder rasterast derheq giştî arîşê û pirsgirêkên civakî dengê xwe didin. Bo mînak li bajarên herêmen Niyoya Înglênd li Amerîka û Kantonên Swîsê û her wiha li dewlatbajarên Yûnana berê jî demokrasîya han dihat şopandin. Demokrasîya rasterast tenê li bajarên biçûk de dikare were meşandin û ji bo welat û bajarên mezin nabe. Di modela han de, demokrasîya nûneratî tê şopandin.

B). Demokrasîya nerasterast ku tê de gel bi hilbijartina nûnerên xwe û şandina wan ji bo Parlemanê, parêzvanîyê ji maf, vîn û berjewendiyên xwe dikin. Îro rojê sîstema han di pirranîya welatên demokrat de tê şopandin.

Li gora nêrîna Marksîstan, demokrasî bi du awayan e, a ayekem demokrasîya siyasî ye ku tê de sîstema hikûmetî a parlemanî û azadiyên takekesên liberçavgiştî, lê çunku demokrasîya han berjewendiyê madî û aborî a takekesan dabîn nake, tenê xwediyê şeklek rûyekî ji azadiyê ye û li gor hizra wan modela han ji bo xapandina gel e û bona berdewambûna çewisandina gel ji aliyê civaka burjûwaziyê ye. Modela duyem, demokrasîya kemilî ye e ku giştî hewcehiyên aborî û civakî bixwe ve digire. Di şewaza han de, mafê tim takekesan tê liberçavgiştî. Bingeha modela han li ser aboriya welat hatiye damezrandin û bi raya kesên han giştî hewcedarî û alavên jiyana kedkar û zehmetkêşan di şewaza han de tê liberçavgiştî. Marksîst li ser vê baweriyê ne ku modela han a hikûmetî dikare armancên gel bicî bîne û delîvê ji bo hînkirina takekesan pêk bîne. Di encam de, ew digihîjin wê baweriyê ku hetanî milkdariya taybet berdewam û hetanî sermayedarî di welat de ji holê nehê rakirin, demokrasî dê her li gor berjewendiyê sermayedarên be û jiyân û hizra takekesên civakê ji aliyê sitemkar û talançyan ve dikeve ber êrîşê.

Pêvajoya geşekirina demokrasîyê li Ewropayê gellek evraz û nişiv bi xwe ve dîtîye. Bo cara yekem di sala 1215'an de, **King Con** Şahê Înglîstanê, piştî serhildanek gellî, fermanek wajo kir ku bi Carnameya Mezin hate nasîn. Bo cara yekemîn di carameya han de, civatek ji bo nûnerên gel hate diyarîkirin. Demokrasîya parlemanî ji sedsala 17'an şûn de, pêvajoya geşekirina xwe şopandiye û bi vî awayî hêdî hêdî desthilata Şah hatiye kêmkirin.

Çavkanî:

Ferhengî Ramiyarî Nîga "Azad Weledbegî"

Danêşnamêyê Siyasî (Political Dictionary) "Daryûş Aşorî"

Rêbaza Şehîdan Heta Roja Azadiyê Berdewam E

Hejmara 84 a Agirî tevî **Roja Şehîdên Kurdistanê** hevdem bû. Bona rêzgirtin ji Şehîdên rêya azadî û rizgariya Kurdistanê, PDK Îranê di gaveke neteweyî û berpirsiyarane de, 10'ê Xalkelêweya sala 1358 (29.03.1980)'an, roja îdam û şehîdkirina Pêşewa Qazî Mihemed û hevalên wî weke Roja Şehîdên Kurdistanê diyarî kir û hemû salê, di vê roja dîrokî de, Şehîdên nemir û birûmet ên rêya azadiya Kurd û Kurdistanê tê bibîranîn û rêz ji fidakarî û cangorîtiya wan tê girtin.

Di salvegera Roja Şehîdên Kurdistanê a 2008'an de, em Şehîdên xwe ên serbilind bibîr tînin û dibêjin şehîd qet namirin û rêbaza wan heta roja azadî û serkevtinê her berdewam e.

Desteya Weşana Agirî

Paşkoya Hejmara 84'ê A Agirî
Tatbet Bi Boneya Roja Şehîdên Kurdistanê

Peyama Komîsyona Civakî Ya PDK Îranê Bi Henceta Roja Şehîdên Kurdistanê

Rêzdar **Mistefa Hicrî, Sekreterê Giştî yê PDK Îranê!**
Hevalên rêberî û Kadro û

Pêşmergeyên birûmet!**Mêvanên hêja!****Malbata serbilind a Şehîdan!**

Îro em li dora hev kom bûne heta roja 10'ê Xalkelêweya 1326'an a Rojî (29.03.1947), bibîr bînin ku di wê rojê de **Qazî Mihemed** rêber û Pêşewayê neteweyî ê gelê Kurd û Serok Komarê dewleta Komara Kurdistanê tevî **Seyfê Qazî û Sedrê Qazî**, bi tawana berevanî ji azadiya gelê Kurd bi fermana Mihemedrizza Şahê Pehlewî hatin daliqandin. Di 10'ê Xalkelêweya sala 1358 (29.03.1980)'an, di 32'hemîn salvegera lidarvekirina Pêşewa û hevalên wî de, Partiya Demokrat ev roje weke **Roja Şehîdên Kurdistanê** îlan kir. Ji wê salê virde hemû salekê xelkê Kurdistanê di roja 10'ê Xalkelêweyê (29'ê Adarê) de li her cihê bin û hindî pê çêbin yad û bîranîna wan kesên ku jiyana xwe di rêya rizgarî û serbestiya neteweyî a gelê xwe de beşxandine û bi serbilindî merg û mirin hembêz kirine, zindî dikin.

Dijmin şaş têgihîştibû, jê ve bû bi şehîdkirina Qazî Mihemed dê bikare bîr û ramana azadîxwaziyê di nava gelê Kurd de ji nav bibe. Bûyerên 61 salan dî şehîdbûna Pêşewa nîşan dane ku bikaranîna bêdadaletî û newekheviyê ne tenê her pêla kerb û hîrsa gel nesekinandiye, belkî roj bo rojê xurt û bihêzîr kiriye.

Bo cara yekemîn di dîroka Îranê de Pêşewa karî tevgera demokrat a seranserî ji girîngiya bizava azadîxwaziyê Kurdistanê hişyar bike û wan pê bihesîne, bi curekê ku demokratxwazên Îranê hêviyê mezîniyê di azmûna Kurdistanê hebûn. Di heman demê de pêşewa rêberêkî jîr, bîrmend û ramanwer bû, di hevdîtinekê de tevî berpirsiyarên Balyozxaneya Amerîka li Tehranê, amadebûna xwe ji bo çêkirina pêwendîya dostane a Hikûmeta Kurdistanê û Amerîka di warê siyasî, pişesazî û çandî de dabû xuyakirin, daxwaza vê çendê ji wan kir ku di pêxema nehêlan û ji holê rakirina dîktatoriyê û avakirina rejîmê demokratîk û federal weke Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê di Îranê de bixebitin. Stratejiyê wisa ku di vê qonaxa niha de ê bûye dirûşma beşeke berçav ji hêzên pêşketinxwaz ên Îranê û di vê rêyê de xebatê dikin.

Ramana aşî û yekîtiya gelên azad, bandoreke taybet û mezîniyê di bîr û kesayetiya Pêşewa de hebû, ji ber vê yekê bû ku yekîtiya refên gelê Kurd hate holê û nakokî û dubendî jî hate rakirin, navmala Kurd bû yek û

yekdengî û yekhelwestiya rêberiya siyasî a Kurd bû xaleke girîng di pêşdebirina doza Kurd de. Bo mînak rola **Barzaniyan** bi serokatiya **General Mistefa Barzanî** yê nemir di dîroka Komara Kurdistanê de rolek ji bîr nekirî ye. Her ew bîra pêşketinxwaz delîveyê jêhatî ji bo damezrandina pêwendiyê dostane di navbera gelên Îranê bi giştî û nemaze du gelên cîran ên Kurd û Azerî de afirand. Di vê navberê de jî pîrsa demokrasî, azadî û wekheviyê kire merca dostîniyê û bi hev

re jiyane tevî gişt gelên Îranê.

Piştî hîloşandina Komarê jî hejmarek zaf ji xebatkarên gelê me tevî karwana Şehîdan bûn, di nava wan de, du serdarên wekî **Qasimlo û Şerefkendî** tê dîtin. Tevî vê yekê niha jî hejmarek zêdetir di refa şoreşgeran de pênuşê wan bidestve girtine, çekên wan avêtine milên xwe, li ser domandina rêbaz û xebat ji bo bidestveanîna armancên wan berdewam in û dijminê kevneperest bêhûde hewl daye ji rêya serkurtkirin û qirkirina xelkê gund û bajarên Kurdistanê, bikaranîna riyakarî, fend û fêlan û soz û qewlên derewîn vî û îradeya gelê şiyar û serhildayî ê Kurd ber bi jarî û lawazî û bêhêvîtiyê bibe û gel neçar bibe bi jiyana bindestî û koletiyê razî bibe.

Dijmin di meşandina vê rêyê de şans û bextê serkevtinê bidest nexist. Ji ber ku heta niha tu kesek di şerê bi heq, rastî û qanûnê de serkevtî nebûye. Azadî û mafê diyarîkirina çarenivîsê mafê rewa û berheq ê mirovî yê her neteweyekê ye. Heke di derbasbûyî de ew mafê bi sedemên cur bi cur an rewşa siyasî a serdem yan bi qazanc û berjewendiyên aborî ji aliyê hinek li desthilatdaran ve dihat bînpêkirin û di asta navneteweyî de jî bi pîrseke hundîrîn di hate mêzekirin, niha dema vê yekê derbaz bûye, di rewşa niha de nabe ku gel di bîndestiyê de bihên hêlan û ji mafê diyarîkirina çarenivîsa xwe bîr bîpêkirin. Evro serdemê hîloşîna dîktatoran û xurtbûna prosesa demokrasî û dabînbûna azadiyên demokratîk e, dema zorxwazî û kedxwariyê nemaye.

Rejîma xwînrêj û kevneperest a Komara Îslamî hewlê dide di bin navê Îsalmê de, bi mifahwergirtina nebaş ji hesta olî, berçavê xelkê lîl û tarî bike û gel ji xebat û berxwedan ji bo bidestveanîna mafê rewa yê neteweyî sar bike û gavên wan di vê rêyê de şil û sist bike.

Piştî dawîhatina şerê navbera Îranê û Îraqê de, rejîma Melayan bi mifahwergirtin ji merem û niyeta paqij a partiya me û bawerî bi aşî û xwe dîrkirin ji belaya şer ku ziyar û xisarên zaf dê ji xelkê bêpar û xedrîlêkirî ê me



Loqman Mehfer

bide, di bin navê gotûbêj û çareserkirina pîrsa Kurd bi awayekî aştiyane karî bi pîlan û kompoyeke nemirovane û dîr ji yasa û pîvanên navneteweyî li ser maseya gotûbêjê Dr. Ebdulrehman Qasimlo rêberê mezîniyê yê partiya me û mamostayê demokrasiyê bi destên dîplomat terorîstên wê rejîmê li Vîyenê Şehîd bike. Dijmin her bi vê çendê nesekiniyê, xwest bi derbên li pey hev û bibandor dengê tevgera Kurd bifetîsîne, lewra di kompoyê duyem de li Berlînê, Sekreterê PDK Îranê Dr. Sadiq Şerefkendî û hevalên wî Şehîd kir ku encama wê cinayetê Dadgeha Mîkonosê derket holê, encamek ku bû sedema riswabûn û terîkmana rejîma Komara Îslamî di asta navneteweyî û naskirina serokên biryarder ên vê rejîmê bi kujer û terorîstên navneteweyî.

Gelê xebatkar ê Kurd Şehîdbûnê bi armanc nadanê û li şer û xwînrîjandinê bêzar e, ji ber ku encamên şer bi tevaya wateyê ve hest pê dike, serbarê vê çendê ku şer bandoreke xirab li ser bîngeha aborî û jiyana civakî heye, bi vî halî jî nikare rêyê bide kevneperestên desthilatdar li ser bîngeha dîktatorî û serberedayiyê û bi navê ol û meseb yan her hêcet û bihaneyêke din a neheq, mafê neteweyî û mirovî ên gel bin pê bikin û di vê rêyê de ji dana goriyên din jî dirêxiyê nake. Em ji girtin, îşkence, teror û îdamê natirs

Ji bo selimandina vê rastiyê, em dê qala beşek ji parastinên Pêşewa û helwestên neteweyî û welatparêz ên wî di dadgeha leşkerî a rejîma Pehlewî de bikin. Bi şahidî û îtirafa hemû ew kesên ku di dema dadgehîkirina Pêşewa û hevalên wî de beşdar bûn, di çaxê dadbîniyê de, Pêşewa ew mehkeme dikirin û desthilatdarên wê demê ên Tehranê bi gunehkar dizanî. Nek Xwe û hevalên xwe li hember hemû ew erk û berpirsiyariyên ku di Komarê de hebûn, bi berpirsiyar dizanî.

Siyaset û helwest û kiriyarên dewleta Tehranê derheq doza Kurd bi şaş û nedurist dida zanî, di bersiva pîrsa serokê dadegehê de, got: "**Hûn tawanbar in, nek em, we welatê me dagir kiriye, ew bûyer di**

encama vê çendê de bûye ku we qanûna bingehîn a welat pêpes kiriye, mafên mirovan û netewe û kêmaniyên ayînî û qewmî li cem we bêbiha û bînirx in. Lewra ez nikaribim li hember maf û azadiyên neteweya xwe de bêdeng û bêhelwest bibim, niha jî tenê ez bi xwe hayder û pêkînerê Komarê û demokrasiyê di Kurdistanê de bûme, tu kes û hêzeke biyanî ez hay nedame. Bêparbûna Kurd jî hiqûqên xwe ez ji bo rêvebirina wan karane teşwîq kirime, heke merem we ji biyaniyan Barzanî û Barzaniyan be, ew ne biyanî ne. Vîra mala wan bi xwe ye, ew mafê wan e ku vir bibin û lere ji bi mala xwe bizanibin."

Dema serdozger Pêşewa bi îxanetkar tawanbar kir, got: " *Îxanet ne hêjayî min e, tu îxanetkar î û nezan û neşareza bi yasa û urfa kilamê. Vîra mala min e, axa Kurdistanê xaka bav, kal û ejdadên min e. Çawa ez dikarim dest jê berdîm. Min tu tirsek ji wê biryara rayedarên we nine. Min mêjdem e xwe ji bo vê yekê amade kiriye. Ez bi hembêzeke vekirî pêşwaziyê jî vê mirina birûmet û serbilindane dikim ku di rêya azadiya neteweya xwe de tîm kuştin, ew soz û ehda ku min ji gelê xwe re daye, bi wan re bijîm û ji bo wan jî bimirim, taze ez dê çawa amade bibim soz û peymana xwe bişkinim'.*

Her ew biwêrî û fidakariye jî bû ku di dema îdamkirinê û di bin sêdarê de, Pêşewa nehêla çavê wî girê bidin. Di wê demê de Pêşewa emir kir û got: " *Ez hez dikim di çirkeyên dawî ên jiyana xwe de, bi çaveke vekirî ji welatê xwe yê ezîz û xweştevî binêrim, hûn şaş in, hûn îro Qazî Mihemedê dikujin, lê bizanin ji her dilopeke xwîneke min Qazî Mihemedêk dê şîn bibe"*.

Bila dijminên azadiyê baş bizanibin ku îro

tu namir î, tu xwediyê hezaran evîndar û xebatkarên demokrat î, piştî te Qasimlo rêberê karizma û navdar ê Kurd, amanc û stîratejiyên partiya te furmole kir û rêberiya partiye girte stûyê xwe û di dem û qonaxên hestyar de rêberî kir, tevî Şerefkendiye jîr ê hevrêyê xwe ji tiribona Rêxistina Enternasyona Sosyalîstê ve doza kurd kirin navneteweyî û di Dadgeha Mîkonosê de, rêberên payebilind ên Komara Îslamî a Îranê li ser kursiya gunehkar danîn.

Mirina wan cure kesayetiyan ne tenê nabe sedema nemana bîr û baweriyên wan, belku piştî mirinê jî bandoreke baş bicî dihelîn. Dibin remz û simbola yekîtiya neteweyî û rizgariya niştimani.

Gelê xweragir yê Kurd û civatên xelkê Kurdistanê!

Partiya we, partiya dayîk, PDK Îranê partiya rêber û rêkxerê tevgera neteweyî – demokratîk a xelkê Kurdistanê Îranê, partiya rojên dijwar û zehmet ên dewranekê ye ku hewcehiyêke dîrokî ew partî aniyê holê. Bi nirxandin û şirovekirina zanistî û dîr ji hest bi bîrpirsiyarîkirinê ve gavan davêje û biryarê digire û rêberiya tevgerê dike.

Bila dijmin û neyar wê rastiyê baş bizanibin, ew partiya di nava dil û hinavê civatên xelkê Kurdistanê de derketiye, lewra bûye beşek ji pîrozîyên wî xelkê ku bi rêber û rizgarderê xwe dizane, hizbek ku tevî êş, derd û elemên gel ji dayîk bûye û bi wan azarane re mezin bûye û emr kiriye, li her kirîz û têkçûnekê ku hatiye ser rêya wê, bi fidakarî û piştstûrbûn bi alîkariya xelkê Kurdistanê ji wan ceribînan bi serfirazî derketiye.

Îro jî xebata azadîxwaziya neteweya me bi qonaxeke aloz û nazik re derbas dibe, hikûmetên desthilatdar bi ser Kurdan, heta tî ji ber radikalbûna tevgera pêşketinxwaz a Kurd bi giştî û proseya demokratîkî xwazî û azadîxwaziya civatên xelkê ên mandî û bêzarbûyî, jar û lawaztir û bêruhiye dibin.

Nemaze rejîma xwînrejî a Komara Îslamî a Îranê ku îro çî di asta raya giştî a navneteweyî, çî di asta hundirê welat de munzewî bûye, herwiha yê ketiye bin zext û givaşên zaf. Di rewşeke wisa de, erkê me ye ku em xebata xwe di hemû waran de xurttir û berfirehtir bikin, yekîtiya refên gelê xwe qahîmtir û hevgirtitir bikin, ji ber ku rejîmeke bêmentiq û bînpêkirinê, makeya terorîzma navdewletî ku gefê ji aşî û ewlekariya çîhanê dixwe, bêguman nikare tevî civaka pêşverûxwaz a dinyaya vê serdemê xwe biguncîne. Em piştrast in ku ew roj nêzik e ku civatên zilmjêkirî ên Îranê, dest di nav destê hev de, dem û dezgehên dîktatorî, serberedayî û kevneperest tîk bipêçin û bi xebata hevgirtî, hemû aliyek sîtemek demokratîk di Îranê de binin serkar û gelên welatê me bi maf û azadiyên xwe bigihîjin.

Beşdarên Hêja!

Îro bi henceta 10'ê Xakelêwe, Roja Şehîden Kurdistanê ve, em silavan ji canê pak ê Şehîden rêya azadî û demokrasiyê û rizgariya neteweyî a gelê çewisandî ê Kurd re dişînin, bi taybet serkêşên vê karwanê Pêşewa Qazî Mihemed, Dr. Qasimlo û Dr. Şerefkendi. Di vê roja dîrokî de, careke din em tevî xwîna wan soz û peymanê nû dikin heta gihîştin bi armanca gelê me yê zilmjêkirî demekê ji xebat û tekoşînê nerawestî. Bi hêviya wê rojê.

Bihiloşe rejîma dîktator û kevneperest a Komara Îslamî a Îranê

Serkeve tevgera rizgarîxwaz a gelên Îranê

Serkeve xebata heqxwaziya gelê Kurd bi rêberiya PDK Îranê

Komîsyona Civakî a Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê
10.01.1387
29.03.2008

Kurtejiya Rêberên Şehîd Ên PDK Îranê

Dîroka 62 sal xebat û tekoşîna pîr şanazî û rûmet a PDK Îranê li çepera xebat di rêya bidestxistina mafê neteweyî û rizgarî ji çewsandin û bindestiyê de, teji fidakarî û canfidaiya keç û xortên neteweya Kurd di nava refên Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê de ye. Kurdistan herdem çepera xebat û berxwedana azadîxwaziyê bûye. Qehremanî û mîrxasiya Pêşmerge û Şehîden PDK Îranê niha jî li ser zarê biçûk û mezinên Kurdistanê ye.

Di nava wan şehîdan de dehan rêberên pêşeng û navdar hene ku jiyana xwe goriyê maf û azadiyên berheq û demokratîk ên xelkê Kurdistanê kirine. Bi henceta 10'ê Xakelêweya 1387(2008)'an, ku roja daliqandina Pêşewa Qazî Mihemed û hevalên wî ku bi **Roja Şehîden Kurdistanê** hatiye binavkirin, Em dê bi kurte nivîsekê şehîden rêber ên PDK Îranê bibîr binin.

Heke em bibêjin Partiya Demokrat take partî ye ku şehîden herî zêde ên rêber heye, me zêde negotiye, dîroka 62 xebata azadîxwaziya vê partiyê rastiya han diselimîne û dide xuyakirin. Rêberên vê partiyê wekî Pêşmerge cangorî, herdem di refa pêşîn a xebat û berxwedan li hember dijminên Kurd de bûne. Li vir em dê tenê navê wan şehîden rêber binin ku di dema şehîdbûnê de, endamê rêberiya partiyê bûne:

Amadekar: Azad Kurdî



Dr. Ebdulrehman Qasimlo



Pêşewa Qazî Mihemed



Dr. Sadiq Şerefkendi



Şehîd Mihemed

Husênxanê Seyfê Qazî

Jidayîkbûn: Sala 1290'an a Rojî li Mehabadê.

Wezîrê Parastina Komara Kurdistanê bûye.

Tevî Pêşewa Qazî Mihemed li meydana Çarçira hate îdam û Şehîdkirin.



Şehîd Sidîq Encîrî Azer

Jidayîkbûn: li bajarê Mehabadê.

Sala 1343'an a Rojî bû endamê Komîteya Navendî.

Sala 1344'an li Kurdistanê Îraqê Şehîd bûye.



Şehîd Mela Rehîm Wêrdî

Jidayîkbûn: Sala 1291'an, li gundek bajarê Bane.

Sala 1343'an bû endamê Komîteya Navendî.

Sala 1346 li herêma Tewêla a Kurdistanê Îraqê Şehîd bûye.



Şehîd Niho (Bapîr Şîkak)

Jidayîkbûn: Sala 1309, gundê Sakan a bajarê Selmasê.

Sala 1343'an a Rojî bû endamê Komîteya Navendî.

Yek ji rêberên tevgera çekdarî a salên 46-47'an bûye.

Sala 1346 Şehîd bûye.



Şehîd Simayîl Şerîfzade

Jidayîkbûn: Sala 1321, bajarê Mehabadê.

Xwendekarê zanîngêhê bûye. Sala 1343'an a Rojî bû endamê Komîteya Navendî.

Yek ji rêberên tevgera çekdarî a salên 46-47'an bûye.

Sala 1347'an a Rojî Şehîd bûye.



Şehîd Silêman Muînî

Jidayîkbûn: Sala 1324, bajarê Mehabadê.

Xwendekarê zanîngêhê bûye. Sala 1343'an a Rojî bû endamê Komîteya Navendî.

Yek ji rêberên tevgera çekdarî a salên 46-47'an bûye.



Şehîd Mela Qadir Wêrdî

Jidayîkbûn: Sala 1324, gundê Menîcelana Bane

Sala 1352'an a Rojî şehîd bûye.



Şehîd Ezîzî Yûsîfî

Jidayîkbûn: Bajarê Mehabadê.

Sala 1343'an a Rojî bû endamê Komîteya Navendî.

10 salan girtî bûye. Di şoreşa gelên Îranê a sala 1979'an serbest hate berdan û ji ber nesaxiya dil her vê salê koça dawiyê kir.



Şehîd Mela Reşîd Husênî

Jidayîkbûn: Sala 1302, gundê Gewre Qela a navçeya Serşîv a Seqizê

Di kongreya duyem a partiye de bû endamê Komîteya Navendî.

Şehîdbûn: Sala 1980.



Şehîd Sergurd Hebûbula Ebasi

Jidayîkbûn: Sala 1326, bajarê Mehabadê.

Xwendewarî: Lîseya Hiqûqê. Di kongreya 4 a partiye de bû endamê Komîteya Navendî.

Sala 1981'an ji aliyê Komara Îslamî ve hate şehîdkirin. Şehîd Ebasi yekemîn Şehîdê rêberiya partiye bû ku ji aliyê Komara Îslamî ve hate teror û şehîdkirin.



Şehîd Ehmed Cavîdfer (HEJAR)

Jidayîkbûn: Sala 1330, navçeya Şarwêran a Mehabadê.

Li zanîngeha Efserî a Tehranê heta lîseyê xwendîye. Di kongreya 5 a partiye de bû endamê Komîteya Navendî. Çend rojan piştî kongreyê 4 di rêya navbera Bane – Serdestê de hate Şehîdkirin.



Şehîd Mihemedsidîq Feroxiyan

Jidayîkbûn: Sala 1333 li gundê Kîselan a bajarê Seqizê.

Endamê Rêberiya partiye bûye û sala 1364 li navçeya Sipîkanî Şîlêrê hate şehîdkirin.



Şehîd Ebdula Behramî

Jidayîkbûn: Sala 1328, bajarê Pawe li Kirmaşanê.

Endamê Komîteya Navendî bûye. Bihara sala 1363 li bajarê Dîwandere hate şehîdkirin



Şehîd Sergurd Kerîm Elyar

Jidayîkbûn: Sala 1320 li gundê Embar a Bokanê.

Sala 1362'an bû endamê Komîteya Navendî û sala 1364'an a Rojî di şereke giran de bi hêzên rejîma Xomeynî ve Şehîd bû.




Şehîd Taha Heqteleb

Jidayîkbûn: Sala 1320, li bajarê Mehabadê.

Di kongreyên 4 û 5 ên partiye de diibe Ravêjkarê Komîteya Navendî.

Sala 1362'an bi êxsîrî tê girtin û sala 1364 li girtîgeha Êvîn a Tehranê hate îdam û şehîdkirin




Şehîd Kemal Debaxî

Jidayîkbûn: Sala 1324, bajarê Mehabadê.

Di kongreyên 4 û 5 ên partiye de diibe endamê Komîteya Navendî.

Şehîd Kemal di serûberkirina komîteyên Îlam û Kirmaşanê de rolekî girîng hebûye.

Bihara sala 1361 di dema rêvebirina erkê hizbî de li bajarê Kirmaşanê hate girtin û payîza sala 1364 an hate îdam û şehîdkirin.



Şehîd Ebdulhekîm Rizayî

Jidayîkbûn: Sala 1334, bajarê Pawe a Kirmaşanê.

Nêzik 10 salan endamê rêberiya partiye bûye.

Sala 1365 an di şereke dijwar tevî hêzên Komara Îslamî de li Seqizê şehîd bû.



Şehîd Sidiq Firozî

Jidayîkbûn: Sala 1339, li gundê Nisil ser bi bajarê Merîwanê.

Di kongreya Heştem a partiye de dibe endamê rêberiya partiye.

Sala 1367 li şereke qehremanane tevî kirêgirtiyên rejîma Komara Îslamî li bajarê Kamyaranê Şehîd bû.



Şehîd Ebdula Qadirîazer

Jidayîkbûn: Sala 1331, bajarê Nexede.

Endamê Ravêjkar û eslî yê Komîteya Navendî ya partiye bûye û li bajarên Bexda û li Ewropayê nûnerê Partiya Demokrat bûye.

Sala 1989'an, tevî Dr. Qasimlo li ser maseya gotûbêjê ji aliyê diplomat terorîstên Komara Îslamî ve hate teror û şehîdkirin.



Şehîd Fetah Ebdulî

Jidayîkbûn: Sala 1340, li gundê Weznê a herêma Sindos a bajarê Nexede.

Çar kongreyan endamê rêberiya partiye bûye. Çend salan nûnerê partiye li derveyî welat bûye. Sala 1992'an li Berlînê tevî Dr. Şerefkendî û Humayûn Erdelan bi destê terorîstên Komara Îslamî hate teror û şehîdkirin.



Şehîd Xefûr Hemzeyî

Jidayîkbûn: Sala 1323, li bajarê Bane.

Çar kongreyan endamê rêberiya partiye bûye. Sala 1994'an li bajarê Bexda a Îraqê hate teror û şehîdkirin.



Şehîd Mensûr Nasirî

Jidayîkbûn: Sala 1335, taxê Husênava li bajarê Sine.


Di kongreya 10 bû endamê rêberiya partiye. Nûnerê partiye li bajarê Silêmaniyê bû. Payîza 1997'an li bajarê Koyê li Kurdistanê Îraqê dikeve ber êrîşa terorîstan û şehîd dibe.



Şehîd Mensûr Fetahî

Jidayîkbûn: Sala 1335, li gundê Kerrawe a bajarê Merîwanê.

Du kongreyan endamê rêberiya partiye bûye. Payîza sala 1997'an li bajarokê Dukan li Kurdistanê Îraqê dikeve ber êrîşa terorîstan û şehîd dibe.



Şehîd Ebdula Şerîfî

Jidayîkbûn: Sala 1342, li gundê Şarezûr a herêma Gewirkayetî a bajarê Mehabadê.

Sê kongreyan endamê rêberiya partiye bûye. Payîza sala 1994'an li derdora bajarê Mehabadê dikeve boşeya



Şehîd Seyîd Selam Ezizî

Jidayîkbûn: Sala 1325 li gundê Ezîzkendî ser bi bajarê Bokanê.

Lîsansa Hiqûqê hebû û karê mamsotayî û dadweriyê dikir. Piştî şoreşan sala 1979'an bû endamê partiye.

5 kongreyan endamê Komîteya Navendî û Deftera Siyasî a partiye bûye. Şehîd Selam rêberekî zana û mezin yê PDK Îranê bû ku mixabin havîna sala 1999'an, bi sedema nexweşiya dil li Bexdayê koça dawiyê kir.

Sedemên Têkçûna Zewacan

Wergeran ji Farsî: Hozan

Zanîna sedemên têkçûna zewacan dikare alîkarê we be bona baştirbûna jiyana we a

hevbeş, pirsgirêkên aborî, hebûna lawaziyê di pêkanîna pêwendiyên de û rewşa hawîrdorê, hinek ji sedemên bingehîn ên têkçûna zewacan tîn hesabandin.

Gişt pirsên han di zewacên salim de jî hene, lê ger bi terzeke baş û bi awayekî eqlanî tevî pirsên han livîn nehê kirin, dibe sedema têkçûna zewacan.


Pêkanîna pêwendî û gotûbêjan yek ji sedemên herî sereke bona serkevtina zewacan tê zanîn. Bê hebûna pêwendî û diyalogê, nakokî û nîqaşên jiyane dibe sedema pêkhatina gellek pirsgirêkan.

Ger jin û mêr di pêkanîna pêwendiyên hewce de bona çareserkirina pirsên di navbera xwe de xwedî şiyar nebin, heta pirsgirêkên wan ên herî biçûk jî nehên çareserkin. Gotûbêj dibe sedema xurtbûn û pêşveçûna têkiliyan û herwiha îznê dide her du aliyên da ku di xwezî, nerehetî, hêvî û hezkiriyên xwe de bi hev re şîrk û hevbeş bin.

Bê hebûna gotûbêjan jin û mêr nikarin bi wî awayî ku hewce ye bi hev re nêzîk bin û tevî hev baş bin. Herwiha hebûna pêwendî û gotûbêjan, vê derfetê dide jin û mêran da ku pirsên xwe bi terzeke salim û eqlanî çareser bikin. Ger yek yan her du alî ji bo çareserkirina pirsên di navbera xwe de xwedî şiyar nebin, çareserkirina pirsên jiyane gellek dijwar dibe. Ji ber ku vê demê her du alî nikarin qisên hevdu guhdarî bikin û hevdu fêhm bikin. Ger zewacek tevî pirsgirêkan berbirû dibe, jin û mêr divê hemû şiyara xwe ji rêya gotûbêj û qinaetpêanîne bikar bixin da ku jiyana xwe rizgar bikin.

Hebûna pirsgirêkên aborî jî yek ji sedemên veqetiyana jin û mêran ji hev tê hesabandin. Bi taybetî zext û kirîzên ku di encama pirsgirêka han de pêk tîn di vî warî de gellek bibandor in. Livîn û tabkirina pirsgirêkên aborî, karekî gellek zehmet e ku zext û givaşeke zaf bo her du aliyên pêk tîne.

Zext û givaşên han bi tenê dikare bingehên jiyaneke salim tîk bişkîne.



Heke yek ji aliyên zewacê girîngiyê zaf bide pirsgirêkên aborî, nikare aliyên din yê zewacê bibîne û wan jî li ber çav bigire.

Karê han dibe sedem ku aliyê din yê zewacê wiha bifikire ku ji aliyê hevjiha/ê xwe îdî girîngî pê nahê dan û eva gellek bitirs e.

Hinek caran hawîrdor û mercên tîkildar bi zewacê jî dibin sedema têkçûna jiyana hevbeş. Zewacên meslehetî, ne zewacên salim in. Dema ku zewacek li ser bingeha hezkirineke rastîn pêk nehatibe, haleta dan û standinekê bi xwe ve digire. Bo mînak ew zewacên ku her du alî bi sedema zext û givaşên malbat, xizm û kes û

dostên xwe neçar in qebûl bikin, yan hinek kes ku ji ber hebûna zarokan dizewicin. Sedemên han ne nîşaneyên salimbûna zewacan e û bêşik zewacên han tevî têkçûnê berbirû dibin. Yek ji sedemên din ên berdanê zû zewicîn e. Piraniya pisporên warê civakî li ser vê baweriyê ne ku zewicîn di nûciwanî û temenê 20 saliyê de ne baş e û kesên ku di vê temenê de dizewicin, nikarin bi awayekî eqlanî tevî pirsên jiyane bilivîn û biçûktirîn pirsgirêk dikare bingeha jiyane tîk bide.

Bi kurtî hebûna lawazî di pêkanîna pêwendiyên de û pirsgirêkên aborî û herwiha rewşa hawîrdor ji sedemên girîng yê têkçûna zewacan tîn hesabandin.

UNICEF: “Li Îranê Yek Milyon Zarok Li Ser Şeqaman Kar Dikin”

Malpera hikûmetî a “Borna”yê da zanîn ku li gor lêkolînên karnasên saziya

UNICEF'ê, tê texmînkirin hejmara zarokên ku li ser rê û şeqaman kar dikin ji 400 hezar kes heya yek milyon kesan dibe.

Eva di demekê de ye ku desthilatdarên rejîma Komara



Îslamî a Îranê hejmara zarokên ku li ser şeqaman kar dikin, qasî 20 hezar û di seranserê welat de jî 200000 kes didin zanîn.

Xwekuştina Keçên Kurd Berdewam E

Navenda Nûçeyan ya PDK Îranê da xuyakirin ku çend rojan berî niha keçeke temen 20 salî bi navê **Kwêstan Mînayî** bi xwarina dermanan xwe kuşt.

Kwêstan Mînayî, berî ku jiyana xwe ji dest bide, ber bi nexweşxaneyê Sine hate şandin, lê piştî du rojan di nexweşxaneyê de jiyana xwe ji dest da.

Hêjayî gotinê ye ku berpîrsên nexweşxaneyê han bona dana termê Kwêstan



ji malbata wê re, daxwaza pereyek zaf kirin.

Navhatî xelkê gundê Askol li derdora bajarê Merîwanê ye ku bi sedema hebûna pîrsgirêkên malbatî bi xwarina derman xwe kuştîye.

Her wiha rojekê berî Newrozê, keçeke 14 salî a Kurd li Urmiyê bi navê **Perwane Mehmûdiyan** ji ber xizani, destkurtî û pîrsgirêkên aborî agir berda xwe û piştî ku çend rojan li nexweşxaneyê Urmiyê de hate dermankirin, ji ber giraniya şewatê, jiyana xwe ji dest da.

Herwiha Rêxistina Mafên Mirovan diyar kir, keçeke din bi navê **Fatime Feyzî**, xelkê gundê Bistam a li ser cadeya Seqiz-Merîwanê, bi sedema pîrsgirêkên malbatî xwe lidar vekir û dawî bi jiyana xwe anî.

Rewşa Tendrustî A Mehmûd Salihî Pîrr Xirab E

Parêzerê **Mehmûd Salihî**, serbarê neyasayî zanîna ragirtina Salihî di girtîgehê de

ragihand: Mehmûd Salihî, bi sedema domandina gireva birçîbûnê di rewşeke pîrr xirab a cismî de ye.

Mihemed Şerîf, parêzerê Mehmûd Salihî, yek ji Karkerên çalak di hevpeyvînekê de tevî “Radio Farda”yê ragihand ku dewrana mehkûmbûna

Salihî di roja 25.03.2008'an de bi dawî hatiye û divêt navhatî ji girtîgehê serbest were azadkirin.

Li gor gotina malata Salihî, navhatî serbarê hebûna nexweşiya gurçîlk û dil, bona eyankirina nerazîbûnê derheq azadnekirina xwe, dest bi gireva birçîbûnê kiriye.

Herwiha Mihemed Şerîf, parêzerê Mehmûd Salihî, serbarê eyankirina nerazîbûna xwe derheq rewş nebaş a Salihî got ku ji bo Salihî bi buxtana şandina peyamê bo derveyî zîndanê, biryara girtineke nû jêre hatiye dan.



Hevwelatîyê Kurd Bi 6 Meh Cezayê Zîndanê Hate Mehkûmkirin

► Ajansa Nûçeyan ya “mukriannews”ê da zanîn ku hevwelatîyê Kurd bi navê **Seyîdcelal Qadirî** li bajarê Bokanê, ji aliyê Dadgeha Şoreşa Îslamî a wî bajarî bi 6 meh cezayê zîndanê hate mehkûmkirin.

Navhatî xelkê devera Mîrava a bajarê Bokanê ye ku bi buxtana hevkarîkirin tevî yek ji partiyeke siyasî ên dijberî rejîmê hatiye mehkûmkirin.

7 Hevwelatîyên Kurd Bi Cezayê Zîndanê Hatî Mehkûmkirin

► Rêxistina Çalakên Mafê Mirovan li Îranê da zanîn ku 7 hevwelatîyên Kurd li bajarê Bane bi salek cezayî zîndana “tezîrî” û 2 saln zîndana “telîqî” hatim mehkûmkirin.

7 hevwelatîyên Kurd bi navên Sidîq Emînnejad, Saman Resûliyan, Ebdulah Rencberî, Kawe Husênî, Mihemed Behramî, Restigar Misgerî û Mihemedemîn Qadirî ku di xwenîşandanên sala 2005'an a bajarê Bane de ji aliyê hêzên rejîma Komara Îslamî a Îranê ve hatibû girtin û piştre bi dana rehîne serbest hatibûn berdan, roja 23.03.2008'an, ji aliyê dadgeha şoreşa bajarê Sin ve bi buxtana têkdana ewlehiya neteweyî û beşdarîkirin di xwenîşandanên neyasayî de, bi salek cezayî zîndana “tezîrî” û du salan cezayê girtîgeha “telîqî” hatin mehkûmkirin.

Hêjayî gotinê ye ku xwenîşandana bihara sala 2005'an a xelkê bajarê Bane, bona eyankirina nerazîbûnê li dijî kuştina sê hevwelatîyên Kurd ji aliyê hêzên rejîma Komara Îslamî a Îranê hatibû lidarxistin.

Jineke 38 Salî Seba Firotna Na Yasayî A CD'an, 4 Rojan Birçî Û Têni Dimîne

► Xatûna Adriyan Turs Filorês a 38 salî seba firotna CD'yên stranan yên ne qanûnî, roja sêşem 25.03.2008'an, ji aliyê dadgehê ve bi cezaya girtîgehê tê mehkûmkirin.

Piştirê Adriyan Turs Filorês di yek ji bendên takekesî ên girtîgeha Dadgeha Waşingtonê de tê ragirtin. Ew jin bi heyamê 4 rojan di rewşeke pîrr xirab de birçî û têni dimîne û heta ji hebûna avdestê jî bêpar dibe.

Navhatî di benda takekesî de di halekê de ku solên xwe danîbû ber serê xwe, raza û heta neçar ma mîza xwe vexwet.

Piştî 4 rojan dikeve bîra memûrê zîndanê ku Adriyan Turs Filorês di benda takekesî de ye û digîjin hawara wê.

SULTAN ŞÊX MÛSAYÊ MÊRDÎNÎ (SULTAN ŞÊXMÛS)

ADAR JIYAN
adarjiyan@mynet.com



X wînerên hêja û rûmetdar,
Ez dixwazim di vê nivîsara xwe de
gerr û bîranîneke xwe ya sala boî bi
we re parve bikim.

Bi rastî jî Rojhilata Navîn, erdnîgariyeke
bêhempa ye. Heta bêbes zengîn û adan e. Ji
bilî vê xaka xwe ya dewlemend û xwezaya
xwe ya rengîn, wekî din jî, wekî navenda
pîrozgeh û serdangehên kevnar e û warê
peyamber(pêxember) û ewliyayan tê zanîn.

Pêxemberên nûna Îbrahîm û Eyûb,
Destbirakö Pêxember (Hz.Muhemmed),
Weysel Qerani, Feylosofê Kurd Şêx Ehmedê
Xani û hwd. Mirovên hêja û payeberz li ser
xaka Kurdistanê jiyane û dîsa canê xwe yê
pak û paqij teslîmî vê xaka pîroz kirine. Îcar, li
gora baweriya gel, dewer nîne ku qencekî
Xuda serê xwe lê dananîbe. Heta gotineke
pêşiyên kurdan heye ku her gav ji aliyê gel ve
tê gotin. "Em bi xêra wan dijîn. Xwedê me bi
ber xêr û şefîta wan bixe."

Li ser rêbeja Amed û Mêrdînê şexsek bi navê
Sultan Şêxmûs heye ku yê navê wî nebihîstibe
û neçûbe serdana wî. Li herêmê ew wekî
"dinya nedî" tê dîtin. Li herêma Amedê. Ruha
û bi taybetî Mêrdînê, mal nîne ku Şêxmûsekî
wê nebe. Çendî ku li derveyî welêt navê
Şêxmûs wekî navekî kurdan were zanîn jî,
dîsa ev nav ji Sultan Şêxmûs an jî Şêx Mûsa
hatiye wergirtin. Sultan Şêxmûs hem navê
şexsekî payeberz û pîroz û hem jî li herêmê
wekî seyrangeheke tê zanîn. Bi awayekî din,
navê wî şexsî û herêma ku lê ye, di nava gel
de wekî "Şêxan" cihê ku tirba wî bi xwe lê ye
jî wekî "Ziyareta Sultan Şêxmûs" bi nav dibe.

Sultan Şêxmûs zat û cenabekî wisa ye ku
bi sedan sal e wekî deriyê xêrê tê pejirandin û
hêvî û şifayê belav dike. Serdana Sultan
Şêxmûs, di nava gel de wekî "ziyaretgeheke
pîroz" tê dîtin û pejirandin. Belê tiştê ku bala
mirov dikşîne ev e. Armanca serdangehê, ne
wekî bawermendiyeke olî; berevajiyê wê wekî
kevneşopiyeye kurdan dixuye. Ango li wê derê
ne tenê zikir û perestî û taeta Xweda; bi
taybetî dab û nêrîtên herêmê yê civakî û
neteweyî û qewat û gerdîşên beriya îslamê
têne pêşandan. Mirov dikare bibêje, salê çend
caran Sultan Şêxmûs dibe qada mîbrîcanên
herêmê û her wiha ji çar nikarên welêt mirov
bi ser gora wî ya pîroz de dibarin. Lewre,
govendgirtîna mirovên bi cil û timtêlên cur be
cur û rengîn, xwarinên bi cêj û ekil, raxistina
fîkîyên tewre bi tewre û kêf û şahiyên ku li
dergeha Sultan Şêxmûs pêk tên, nayên
vegotin. Li aliyekî mirov sewalan ser jê dikin;
li aliyê perestî, nimêj û duayên ber lingê
Sultanê Kull û Ewliya(angosultan Şêxmûs) û
li aliyê din jî kêf û şahî û hengeme li dar
dikeve.

Li aliyekî xwarin û vexwarin, li aliyekî din
govend heng, şahîni, bezm, kêf, eşq, heng,
hingime digere. Li aliyekî ziyaretvan destmêj
digirin diçin hundurê qubeyan Sultanê
Ewliya(Sultan Şêxmûs) tewaf dikin. Li aliyê
din, li ber derî derwêş bi ledana erbanê re

beyt û lawje û qesîdeyan -bi zaravayê gel
qewlan- dibêjin. Li aliyekî mirov wekî rêya
morîstanê diçin û tên, li aliyê din mirov xwe
diavêjin bin siya dar û berên dora ziyaretê, ji
ber westandina tûriz û dîlanê xewa xwe
diçînin/çavê xwe germ dikin...

Gava rojên şemî an yekşema payîza
paşîn, rêya mirov bi Sultan Şêxmûs dikeve û
mirov dikeve nav wê xilbeya mirovên ziyaretê,
gotina "dê weledê(ewlade) xwe diavêje" tê
bîra mirov û mirov ji xwe re dibêje 'Dêmek ev
gotin ji bo rojên wisa hatiye gotin' Birastî jî,
gava ku qîz û xort dawetê digerin û dikevin
nav wê çosa mezin, bûkên ciwan ewladên
xwe davêjin ser xesû û xezûrên xwe û dikevin
govendê, xwe dihejînin. Îcar li Sultan Şêxmûs
mirin tê bîra kê. Kî bi kê ye. Zarokên wînda li
bin guhên hev dikevin. Her ji çar-pênc
deqeyan, dengê dergevanê kal, ji anfiya
dergeh bilind dibe. Geh bi kurdî geh bi
tirkiyeye nivco baiiga xwe se caran dubare
dike .

Belê. Roj nîne ku di riya Sultan Şêxmûs
de qurbanek neyê serjêkirin. Ji aliyekî de
mirovên ku ji bo qeda û belayên dinê bi ser
wan neyên, ji aliyekî ve yê ku qet ber xwe
nabînin, anga zikê wan tîr û yek birçî be; ji
aliyekî ve dewlemendên ku berî xisar bigihêje
mal û canê wan û ji aliyê din ve yê ku ne
teled û weled e, salê carekê tiştêkî xwe (kar,
bizin, berx, dîk û hwd) li Sultanê Ewliya
qewl/nedir dikin. Yê ku qeweta wan hebe
tên li ber serê wî, û yê ku derfetên wan yê
hatinê nîn be qurbana xwe li malê serjê dike û
xêra wê hibeyî Bavê Kal (Sultan Şêxmûs)
dike. Bi taybetî demsala havînê û payîza
paşîn, Sultan Şêxmûs dibe navenda kêf û şahî
û geştiya gel. Malbatên ku karê xwe yê salê
diqedînin, wekî betlaneyê, koçmal xwe li
Sultan Şêxmûs digirin û çend rojên xwe di
nava kêf û şahiyê de derbas dikin û bi hêviya
xêr û bereketa salê vedigerin malên xwe.

Ji şexsiyeta Sultan Şêxmûs bêtir, gel xwe
li kêf û şahî û mihrîcana ku li derdora Sultan
Şêxmûs pêk tê digire. Bi rastî gava ku mirov li
çûn-hatin û tevgera mirovên ku tene dora
ziyareta Sultan Şêxmûs dinihêre, rewşa wan
qet naşibe kesên ku hatibe serdana qencekî
Xwedê an pîrozgehekê. Lewre, ji def û zirmeyê
bigirin heta tenbûr û ribaba ku guhê mirov ker
dike, hemû amûr û alavên dengdêr ji bo kêf û
şahiye tên bikaranîn. Qîz û bûkên ciwan,
zarok, mezin heta mirovên navser xwe li ber
dengê van amûran liba dikin (dihejînin) û
gunehên xwe radiweşînin.

Hûn li kîjan aliyê welêt an jî devera dinê
dibin bibin, ger ku rojekê riya we bi Mêrdînê
an jî Amedê bikeve, bê ku hûn Sultan Şêxmûs
ziyaret nekin venegerin. Lewre mirov dikare
heftê û du çêşid mirov û nîvan li wir bibîne. Ji
çarmedorên dinê mirov xwe li Sultan Şêxmûs
digirin. Bi baweriya hinekan, mirovên ku diçin
Siftan Şêxmûs gunehên xwe, lê bi baweriya
min hişê xwe li wir dihêlin û vedigerin.

Kaniya Helbestan

HELEBÇE



Dildar Ismail

Roj hemî dûmane
Leylane li ber çavên bê ronî
Dîlan û qîr û zare zar
Şeveqa bê hêvî
Lorîkên bê şîr
Kezeba sincirandî
Dilê peritandî
Agirê dijwar
Xwîna tar
Dibare û difûre
Birîna kûr
Min hişyar dike
Hêstîrên gorna bê kefen
Tariye roj û şev
Hawar û nale nal
Dengê zarokên bê zar
Dengê bê guhdar
Avdare kulîlkên zer
Newroze şînî û gulên sor
Qêrîna qad û azman
Li hev dizîvire
Kî şiyar dimîne
Kî xembar dimîne
Azmanê miştî dûman
Cehdeyên renga sor
Dîwarên bê deng
Qelenê xwînê dimîne
Sal û roj li hev tê der
Dijmin dimîne dijmin
Jiyan xwe nûjen dike
Buhar berdewam dibe
Helebçe dimîne nîşan
Bilûr dike fîxan
Yek dest û yek peyiv
Bo dayika niştiman
Birîna hemî kurdan
Helebçe?

Hunermend Şervan:**“EZ DIXWAZÎM BÎ HUNERA STRANGOTÎNÊ, HAWARA GELÊ XWE BÎGEHÎNÎME CÎHANÊ Û XÎZMETEK JÊHATÎ BÎ ÇAND Û HUNERA KURDÎ BÎKÎM”****Hevpeyvîn: Dara Natiq**

Xwendevanên hêja yên Agirî, çend rojan berî niha hunermendekî gellek hêja û birûmet li Bakûra Kurdistanê, hunermend Şervan beşdarî şahiya Newroza 2708'an a Kurdî bû ku li bajarê Koyê û ji aliyê PDKî ve hatibû organîzekirin û bi gotina çend stranên evîndarî û şoreşvanî coş da wê cejna netewî. Me xwest ji nêzik ve wî hunermendê ciwan nas bikin, derheq kar û xebatên hunerî ên wî hevpeyvînekê çê bikin:

Hunermend Şervan, ez li ser navê tev xebatkarên rojnameya Agirî ve

dibêjim tu bixêr hatî bo Kurdistanê azad.

Gellek spas, ez jî li Bakûrê Kurdistanê li bajarê Wanê bi hatina Kurdistanê azad gellek keyfxweş im û silav û hurmetên xwe dişînim bo tev xebatkarên rêya rizgariya Kurd û Kurdistanê û bi taybetî xebatkarên rojnameya Agirî û serkevtinê ji wan re dixwazim.

Hunermend Şervan kî ye?

Ez sala 1974'an li gundekî bi navê Paşan

ser bi bajarê Wanê li malbatekî herî hunerhez û welatparêz ji dayik bûme.

Te jiyanê xwe ya hunerî çawa dest pê kir?

Hunermend Kazo, hunermendekî herî bi bîr û bawer e. Min ew pirr hez dikir. Min hertim di xeyalên xwe de digot ku tu bêjî Xwedê dengê daba min, ez jî weke Kazo bistirama. Yanî dikarim bêjim eşq û hogirbûna min bi dengê Kazo re ez elqedar kirim ku stranan bêjim û îro rojê bibim hunermend.

Heta niha te çend berhem derxistine?

Min bi awayekî fermî di sala 2003'an de dest bi çêkirina kasêtan kiriye û heya niha 4 berhemên min hatine belavkirin û di 6 festîvalan de jî beşdar bûme.

Armanca te jî strangotînê çî ye?

Ez dixwazim bi rêya hunera strangotînê ve, hawara gelê xwe bigehînimê cîhanê û xizmetek jêhatî bi çand û hunera Kurdî bikim.

Pilan û pirojeyên we yên hunerî

ji bo pêşerojê çine?

Ez dixwazim di pêşerojê de bi xebat û tekoşîna xwe ya hunerî û bi berhem û keda xwe di pêxema pêşvebirina çand û hunera Kurdî de bi awayekî zanistî û îroyîn xebata xwe bimeşînim.

Hunermend Şervan, di nava stranên xwe de herî zêde hez ji çî stranekê dike?

Strana herî xweş cem min, strana min ya bi navê "Semê" ye. Ji ber ku min ev ji bo evîna xwe ya jidestçûyî gotiye.

Şervan jiyanê hevbeş pêk anîye an ne?

Nexêr.

Hunermend Şervan vê gavê evîndar e yan na?

Ez demekî evîndar bûm. Lê ez çend

îro rojê muzîk û strana Kurdî rolekî bibandor di cîhanê de dilîze. Hêvîdar im ku bi xebat û îradeya tev aliyekê em bikarin gavên baş bo zêdetir pêşxistina hunera Kurdî bavêjin.

Bi baweriya te gelê me yê Kurdistanê Bakûr heya çî qasekê di warê çand û kultura xwe de serbest in?

Mixabin li Kurdistanê Bakûr azadî tune ye. Dewleta Turk her tim siyaseta asîmîlekirin û tunekirina netewa Kurd weke armanc û stratejiya sereke a xwe meşandiye. Heya îro jî dewleta şovînist a Turk îzna xwendin û nivîsîn bi zimanê Kurdî nedaye. Gelê me li Bakûr li mafên herî sereke yên xwe bêpar in û serbestî û azadî hesreta wan ya çend sed Salî ye.



Gava mirov guhdariya stranên hunermendên me yên Kurdistanê Bakûr dike, piraniya stranên wan derheq şorişên Kurdan, bêbextî li dijî Kurdan û bindestiya Kurdan hatine gotin. Hûn sedema vê çendê çawa dibînin?

Gelê me bi salane ku bindestiyê de dijî û hertim xebat û tekoşîn kiriye bo rizgariya netewa xwe û gihîştin bi mafê xwe yê netewî. Di vê pêxemê de jî gellek şoriş û berxwedanî

hatine kirin. Gellek bêbextî bi ser miletê me de hatine. Gellek rêberê mezin ên Kurdan mîna Şêx Seîd, Qazî Mihemed û Dr. Qasimlo û... hatine şehîdkirin. Lê tabê ev çende nahê jibîrkirin û ji bo nifşa pêşerojê dibe berjeng û hemû ew kesên ku me bas kirin, bûne sebeb ku hunermendên me zêde derheq doza Kurdan bistirin.

Hûn ji wan ciwanên me yên ku taze dixwazin têkevin nava stran û muzîka Kurdî de, çî dibêjin?

Tiştêkî gellek baş e. Îro her hunermendekî Kurdan weke lîderekî ye, hêvî dikim ku ciwanên me yên ku taze dixwazin bibin hunermend risaleta hunera Kurdî biparêzin.

Gotina we ya dawî?

Ji bo Rojhilata Kurdistanê dibêjim ji we û xebata we ya azadîxwaziyê serkevtinê hêvî dikim.

Sipasiyê ji PDKî dikim û ji xebatkarên Agirî re jî serkevtinê dixwazim.

Newroz e... Newroz e...

Newroz e... Xuşexuşa dilê biharê ye. Çiveçîva strana azadiyê ye. Kulîlkên stûxwar ên adarê, xwe li bêhna sibehên welatê min digirin.

Newroz e... Bêrîkirina azadiyê, wekî pêtên agirî ji rûyê zarokên delalokî dipeke û bi govendgerîna xwe ve li rûyê gund û bajarên min ên dagirkirî dikeve... Rêça şervanên bênav, bi çirûskên rojê re şîn dibin.

Newroz e... Kela dilê min dibe kenogirî û xwe berdide ser hemû hêviyên şîlanên siya Newrozê. Tilîliyeke porspî ji dilê min dipeke û bi tilîliyên din ên dilevîn re dibe banga azadiyê.

Newroz e... Bi gotinên serxweş re, hêsirên dayikan aş dikim û direşnim ser hemû deşt û zozanên Kurdistanê.

Newroz e... Lo lo şaîro, "ji min re qala baranê neke!"(1), ronahiya Newrozê bibarîne ser hinavên civaka min; tovê rojeke nû bireşîne ser xewnên dayikên

xemgîn.

Newroz e... Lo lo şehîdo, de vêca serê xwe rake, êdî wext e, bide xatirê vê roja nû û bide xatirê mezinahiya xwe, ji dilê xwe yê henûnok qanûneke nû çêke û hemû "Ne-yaran bixe yar û dost û bira!"(2)

Newroz e... Daweta qewmê ji agir e. Prometheus banga vê dawetê kiribû: Serî li hemû 'Xweda'yan hildabû, ji wan agir dizîbû û ji însanan re xistibû destmal! Kawayê Hesinkar agir berdabû textê hemû dîktatoran. Niha zarokên Qendil û Helebçeyê pêta vî agirî gurtir dikin û xewneraşkên nû direşnin ser serê dîktatorên dilreş.

Newroz e... Ezbenî, çavê te ronî, "Roj ku dibûye î' dê Newrûz... Bilcumle diçûn der ji malan hetta digihîste pîr û kalan..."(3), mizgînî li te helbestvanê nemir, "Wa roj helat le bendenî berzî welatewe, Xiwênî şehîd rengî şefeq şewiq her edatewe"(4), êdî xemê nexwe,

Evdile Koçer

evdilekocer@yahoo.com



gotinên te bûn ala û ketin ser siya gelek dengxweşan.

Newroz e... Keçika ku dilê xwe bi çîçekên Newrozê xemilandiye, xortê ku hezkirinê di paşla xwe de germ dike, dê çaverêya hev bikin, dê agirê dilê xwe vêxin û dê serê xwe deynin ser bihara rojeka nû.

Newroz e... Ez ê îro kaniya hemû ramûsanên dilê xwe bi awirên yara xwe der bikim û ji hinarkên wê re bixim rojeke nû û ez ê jê re bibêjim: Newroza te pîroz be!

- (1) Víctor Hugo
- (2) Paul Eluard
- (3) Ehmedê Xanî
- (4) Pîremêrd

Li Mehabadê Bi Hinceta Cejna Newrozê, Şevbêrkek Helbestan Birêve Çû

Navenda Nûçeyan ya PDK Îranê da zanîn

ku roja 25.03.2008'an, bi hinceta cejna neteweyî a Newrozê û destpêka sala nû a Rojî, li bajarê Mehabadê ji



aliyê **Koma Ciwanên Şana** ve, şevbêrkek helbestna birêve çû.

Helbestvanên naskirî yên bajarê Mehabadê, Bokan, Urmiye, Serdeşt û Bane bi xwendina helbestan beşdarê rê û resmê bûn.

Naveroka piraniya helbestan neteweyî û evindarî bûn ku ji aliyê beşdaran ve bi germ hatin pêşwazîkirin.

Şevbêrka helbestan heya demjimêr 12'ê şevê bi xelatkirina helbestvanên beşdar bi dawî hat.

Hêjayî gotinê ye ku Koma Ciwanên Şana, saziyek nedewletî û serbixwe ye ku di sala 2001'an, ji aliyê komek ji ciwanên bajarê Mehabadê ve hatiye damezrandin û serbarê zext û givaşên rejîmê, saziya han heya niha jî di pêxema berfirehtirikirin û dewlemendkirina çand û hizra neteweya Kurd xebatê dike.

TV'ya Enistituya Kurdî Dest Bi Weşana Testê Kir

Kanalek nû ya Kurdî dest bi weşanê kir. TV-Kurd ku bi navê Kurdî weşanê dike ji îro pê ve dest bi weşana Testê kir.

Wek tê zanîn ev TV ji aliyê birêveberiya Enistituya Kurdî ya Parisê ve tê meşandin û li bendê ne ku payîzê dest bi weşana normal bike.

Frekansê TV'ê
Hotbird 13 derece rojhilat
Frekans: 12245
Horizontal
Symbol Rate. 27.500
Fec:3/4



Birêveçûna Rê û Resma Cejna Newrozê Di Binkeya Deftera Siyasî A PDK Îranê De

Roja çarşem, 19.03.2008

8'an, rê û resma cejna Newrozê, bi beşdariya birêz **Mistefa Hicrî**, Sekreterê Giştî yê PDK Îranê, endamên rêberî ên PDK Îranê, Kadro û Pêşmerge û malbatên wan, di binkeya Deftera Siyasî a partiyê de hate



lidarxistin.

Rê û resm bi sirûda "Emro jî Salî Taze ye"(Îro jî sala nû ye), ji aliyê girûpa hunerî a YJDK Îranê ve destpê kir.

Piştê Mistefa Hicrî, peyama newrozî a xwe pêşkêş kir.

Li doma rê û resmê de, **Farûq Soltanî**, stranek pêşkêşî beşdaran kir.

Piştê hunermend **Şervan** ku ji bajarê Wan li Bakûrê Kurdistanê ve beşdarî rê û resmê bibû, çend stranên xweş pêşkêşî beşdaranê rê û resmê kir.

Her wiha peyama du saziyên YJDK Îranê û YCDK Îranê, bi hinceta cejna Newrozê, ji aliyê xatûna **Ronak Fatihî** ve hate xwendin.

Rê û resm bi pêşkêşkirina peyama **Kerîm Perwîzî**, Sekreterê YXDK Îranê, bi hinceta serkevîna yekemîn kongireya vê saziyê a bi navê RABÛN û her wiha bi hinceta hatina cejna Newrozê, dom kir.

Piştê agirê Newrozê ji aliyê Mistefa Hicrî û keça şehîdekî ve hate hilkirin.

Rê û resma han di nava govend û dîlana beşdaran de, bidawî hat.



Topbarana Hêzên Komara Îslamî Yên Bo Ser Herêma Kurdistanê Berdewam In

► Hêzên Komara Îslamî a Îranê zêdetirî 15 rojan e ku bi berdewamî gund û deverên cuda cuda ên Herêma Kurdistanê topbaran dike. Gund û nahiyeyên deverên Qeladizê, Çoman û Pişderê. Bi vê sedemê zîyan û xisarên zaf û giran gihîştine xelkê deverên han û hejmarek gund bi tevahî hatine valakirin û akinciyên deverên han aware û derbiderî cihên din bûne.



Topbarana berdewam a hêzên Komara Îslamî tirs û nigeraniyeke zaf xistiye nav dilê akinciyê sivil ên van deverane.

Di çend mehên borî de, çendî caran



Çendî gund û deverên Herêma Kurdistanê ji aliyê hêzên Komara Îslamî berdewam tîn topbarankirin

sînorên Herêma Kurdistanê ketiye ber êrîşên topbarana hêzên Komara Îslamî.

Berdewkê Dîwana Serokatiya Herêma Kurdistanê ji ber topbarana gundên Herêma Kurdistanê, ew kiryara Îranê mehkûm kir û daxwaz kir ku Komara Îslamî êrîşên xwe bide rawestandî. Lê topbarana wan deveran her berdewam e.

Komara Îslamî Di Sala 1386'an de, 27 Belavok Daxistin

► Vê dawiyê raporek di malpereke hikûmetî li Îranê hate weşandin û tê de hate aşkerakirin ku di sala 1386'an a Rojî (2007-2008) de, rejîma Komara Îslamî a Îranê weşana 27 belavokên cur bi cur qedexa kiriye. Ji wê demê virde ku Ehmedînejad bûye Serok



Komar, weşana 67 belavokên cur bi cur hatiye qedexekirin.

Rapora han, sala 86'an bi **sala xatirxwazî** ji medyayên rexnegirên dewletê binav dike! Di vê raporê de tenê medyayên ser bi baskên cuda cuda ên rejîma Komara Îslamî ketine ber nixandî. Di halekê de rapora han tu îşareyek bi sedan malperên cur bi cur ên neyarên rejîmê nake ku tîn sansorkirin û dehan rojname, kovar û belavokên ser bi hêzên Opozîsyona hikûmetê ku tu demekê rê nahê dayîn di hundirê welatê de bi azadî bihên weşandin, nehatiye kirin.

Li Asyayê 5 Milyon Nexweşên AIDS'ê Hene

■ Li gor raporekê ku BBC'ê weşandiye, Rêxistina Neteweyên Yekbûyî derheq rewşa nexweşiya AIDS'ê raporek nû weşand û eşkere kir ku li parzemîna Asyayê 5 milyon kes tûşî nexweşiya ADIS'ê bûne. Rapor dide zanîn ku her sal 440 hezar kes jî ji ber sedem û bandorên xirab û bixeter ên nesaxiya han dimirin. Rapora han a NY diyar dike ku heta sala 2020'an dê 8 milyon kes bi nexweşiyên han bikevin û her sal dê 500 hezar kes jî ber vê nexweşiyê bimire.

Rapora NY derbarê rewşa vê nexweşiyê di 23 welatên Asyayê de de hatiye



amadekirin. Herwiha rapora han serjimariya welatên Asyayê zêde dide diyarkirin.

Amerîka Şehîdkirina 3 Kurdên Qamişloyê Mehkûm Kir

► Piştî ku li roja 20'ê Adara 2008'an, di şeva Newrozê de, 3 kurdên xelkê bajarê Qamişloyê ji aliyê hêzên Ewlekariyê ên Sûriyê ve hatin şehîdkirin, dewleta Amerîkayê bi tundî rexne li Sûriyê girt û daxwaz ji Şamê kir ku di vê derheqê de lêkolînê



dest pê bike. Berdevkê Wezareta Karê Derve ya Amerîkayê "Sean McCormack" di daxuyaniyekê de diyar kir ku Amerîka êrîşa dewleta Sûriyê a bajarê Qamişloyê şermezar dike û daxwaz ji Sûriyê dike ku dest ji bikaranîna tehdîdên tund û tuj berde. Hêjayî gotinê ye ku di şeva Newroza 2008'an, 3 kurd li Qamişloyê hatin kuştin û dehan kes jî hatin birîndarkirin û girtin.

Xizmetek Nû ji Kitêbxaneya Kurdî SARA DISTRIBUTION'ê

► Ji bo bidestxistina pirtûk û berhemên Kurdî xizmeteke nû. Kirîna **weşanên kurdî** bi riya **ONLINE** payment:

Li malpera Kitêbxaneya Kurdî SARA DISTRIBUTION her kesê/a ku bixwaze dikare yekser bi riya PayPalê weşanên



kurdî ji xwe re bikire.

Ji bo bidestxistin û kirîna ûirtûkên kurdî bi rêyeke rihet û hêsan, hûn dikarin li ser vê linkê bitîkin:

http://www.kurdishbookbank.org/book_bok_kitap.htm